ROJEV

1 Kanûn - Sêşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 19


HAYÊ DEWLETÊ JI KUŞTINA DTP'IYAN HEBÛ

# FERMAN JI QEREQOLA ÇEMANÊ



**Dengê Zekî Akdoganê bi sedema tevli qetilkirina du DTP'iyan bûye hatibû girtin, derket holê. Akdogan navên qatilên rastîn di îfadeyên xwe de nedane**

### QEYDÊN KUŞTINA 2 DTP'IYAN

Têkildarî qetilkirina endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş tomara deng ya kiryarên bûyerê Zekî Akdogan hate bidestxistin. Di tomara deng a Akdogan de tê diyarkirin ku qetilkirina Olmez û Edîş ne ji bo pereyan, ji ber ku DTP'î ne pêk hatiye. Di qeyda deng de tê fêmkirin ku Olmez û Edîş ji ber ku çûne Mîhrîcana Berxbirê fermana kuştina wan ji aliyê fermandarên qereqola Çemanê hate dayîn.

### PLANA KUŞTINÊN DIN DIKIRIN

Di qeyda hate bidestxistin de gelek agahiyên bûyerê zelal dikin derdikevin holê. Di tomara dengê Endamê "Tîma Xençer" Zekî Akdogan, ku piştî bûyerê hate girtin û niha li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê girtî ye, hemû aliyên bûyera qetilkirina endamên DTP'ê Olmez û Edîş ronî dibin. Di tomara deng de, kî, çawa, çima Olmez û Edîş qetil kirine û piştî wê plansaziyên wan çi bûn hemû cih digire... RÛPEL - 3



# 'Edî gotin bêwate ye'

KCK'ê daxuyand ku kiryarên li dijî Rêberê KCK'ê Abdullah Ocalan xeleka dawî ya jiholêrakirinê ye û divê her kes li hemberî vê pêvajoyê hişyar be û bêdeng nemînin

### KCK: BÊDENG NEMÎNIN

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê destnîşan kir ku, desthilatdariya AKP'ê, di bin navê cihguhertinê de, pêvajoya jiholêrakirinê daye destpêkirin û wiha got: "Ev darbeyek e. Bi vê darbeyê, pêvajoyeke nû dane destpêkirin." KCK'ê xwest ku tu dijî vê bêdeng nemîne... RÛPEL - 5

### KOMÊN AŞTIYÊ DAXUYANÎ DA

Endamên Komên Çareseriya Demokratîk û Aştiyê ku li ser banga Ocalan ji Qendîl û Mexmûrê hatin, têkildarî rewş û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daxuyanî dan û diyar kirin ku li Îmralî çi dibe bila aşkera bikin û gotin DMME û CPT ji mercên Ocalan berpirsiyar in... RÛPEL - 4

### NERAZÎBÛNÊN SAZIYAN DIDOMIN

Nerazîbûnên li hemberî pêkanînên li dijî Ocalan berdewam dikin. DÎSK'ê helwesta li dijî Ocalan şermezar kir. KESK jî rewşa Ocalan di rojeva Meclisa Şêwirînê ya KESK'ê de dê binirxîne. Lijneya Rêveberiya DTP'ê jî ji bo rewşa Ocalan binirxîne civiya... RÛPEL - 4



## Gelê kurd ji bo Ocalan rabûye ser piyan

*Li dijî girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li gelek herêmên Kurdistanê û Tirkiyeyê gelê kurd rabû ser piyan û çalakiyên şermezarkirinê li dar xistin. Di çalakiyan de, di navbera polîs û gel de pevçûn qewimîn. Ciwanên kurd, her der wergerandin qada şer. Her wiha li gelek bajaran dikanên xwe venekirin û kiryarên li ser Ocalan şermezar kirin...* **RÛPEL - 5**



## Hunermenda tunusî bi kurdî jî distrê

Hunermenda tunusî Emel Mathlouthi besteyan çêdike, stranan dibêje û bi tarzê xwe yê nû reng dide muzîka Tunusê. Mathlouthi ku pêşandanên kuçeyan li dar dixe îro bi kurdî û gelek zimanên din distrê...

ÇAND R9



## Rêwîtiya werara mirovahiyê

Ciwanê kurd Hîdayet Taşan li bajarê Bonna Almanyayê peykersaziyê dike û niha li ser projeyeke ku zarokekî piştî 3 milyon salan ji dayik bibe dê di rewşeke çawa de be radiweste û rêwîtiya mirovahiyê vedibêje...

ÇAND R9

## Her kes dizane 'Çala mirinê' çi ye

Rêber Apo şert û mercên cihê lê dimîne weke "Çala mirinê" bi nav kir. Vê binavkirina Rêber Apo, tê wateya îfadeyek e ku nirxandinên heta niha ji bo pergala işkenceyê ya Îmraliyê hatine kirin jî derbas kiriye. Dema "Çala mirinê" tê gotin, kesên ku wateya wê nizanibin tune ye. Di Serdema Navîn de heta beriya wê kesên zalim û desthilatdar dema dixwazin hin kesan îmha bikin ew diavêtin bîrên bêbinî. *Nivîsa Cemîl BAYIK* R.2

### Wargeha Mexmûrê ji xwe kirin hedef



Dewleta Tirkiyeyê, wargeha Mexmûrê kiriye yek ji armanca xwe ya sereke. Bêguman armanca wan ya yekemîn û sereke Îmralî ye...

AHMET AKTAŞ R5

# Polîsan mudaxeleyî mîtîngê kir



Li Sêrtê bi armanca bal kişandina şert û mercên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û şermezarkirina tecrîda li dijî Ocalan li Garaja Şaredariyê mîtîng pêk hat. Polîsan mudaxaleyî girseya beşdarî mîtîngê bibûn kir û xwest ciwanekî binçav bikin. Bi vê yekê re bûyer mezin bû û polîsan zêdeyî 20 kesan binçav kirin. Piştî mudaxaleya polîsan pevçûn li nava taxan belav bû. Li Mêrsînê jî pêşandanên ku ji bo şermezarkirina şert û mercên Ocalan dest pê kiribûn, duh dîsa dest pê kir. Polîsan mudaxeleyî çalakiyê kir. Dema rojnameya çû çapê li her du bajarn jî pevçûna di navbera çalakger û polîsan didomiya.

www.arsivakurdi.org

Rêgeh

CEMÎL BAYIK

# Çala mirinê

Rêber Apo şert û mercên cihê lê dimîne weke "Çala mirinê" bi nav kir. Vê binavkirina Rêber Apo, tê wateya îfadeyek e ku nirxandinên heta niha ji bo pergala işkenceyê ya Îmraliyê hatine kirin jî derbas kiriye.

Dema "Çala mirinê" tê gotin, kesên ku wateya wê nizanibin tune ye. Di Serdema Navîn de heta beriya wê kesên zalim û desthilatdar dema dixwazin hin kesan îmha bikin ew diavêtin bîrên bêbinî û derketina jê ne mumkûn be. Zalim û desthilatdaran di bîrên bêbinî yên îcad kirine de ji kesên dixwazin îmha bikin nedihiştin li ser rûyê erdê tu berhem û şopên wan bimîne. Dema navê wan dihat bibîranîn jî diketin nava hewldanên taybet ku ji rewşa tê zanîn cudatir nîşan bidin. Di dîrokê de kesayetên ku bi vî rengî jiya ne her tim hebûne. Hallac-i Mansûr, Manî, Nesîmî, Brûno hwd. kesayatên wiha ne ku di dîrokê de cih girtine. Lê dîrok ne weke kesên desthilatdar û zalim dixwazin nîşan bidin, weke rastiya ku ew dijiyan di hişmendiya mirovahiyê de daye jiyandin. Bi vî rengî kesên zalim, desthilatdar destûr nedane ku dîroka ji bilî ya ew dixwazin bê nivîsandin. Nivîsandina klan, nirxên komunal û demokratîk ên gelan asteng kirine. Gelan dîroka xwe ya demokratîk û komunal li gorî şertên xwe nivîsandin e an jî jiya ne.

Di roja me ya îro de li cihên dîrokî mirov rastî şopên bermayiyên wiha tên. Mirov divê biçin cihên wiha bibîne û wehşetên bi vî rengî yên bûne malê dîrokê şermezar bikin.

Hêzên zalim, emperyalîst, dagirkerên herî barbar ên roja me bi avêtina Rêber Apo ya "çala mirinê", mîrasa ku ji zalimên di dîroke de behsa wan tê kirin wergirtine, berdewam dikin.

Rêber Apo, hêzên sermayeya global ên roja me, weke şopdar, nûnerên hêzên emperyalîst û dagirkerên destpêka dîrokê bi nav kir. Di heman demê de nirxand ku ev hêzan ji yên wê demê hêj talûketir in. Niha ev hêzan weke di dîrokê de, di roja me ya îro de ji Rêber Apo tolê distînin û hewl didin ku nehêlin li pêşiya pergalên xwe yên dagirkerî û desthilatdariyê bibe asteng.

Nûnertiya hêzên emperyalîst û dagirker ên roja me di serî de DYA, Îngilistan û hêzên sermayeya global dikin. Ev hêzan ji bo desthilatdariya xwe bi hemû cîhan/gerdûnê bidin qebûlkirin hevkariyên xwe jî bi kar tînin. Yên Rêber Apo avêtine "Çala mirinê" jî ev in.

Rêber Apo ji aliyê hêzên sermayeya global bi Komployeke Navneteweyî êsîr hate girtin. Ji ber vê yekê, Rêber Apo di rastiya xwe de êsîrê van hêzan e. Ev hêzan bi êsîr girtina Rêber Apo, xwestin astengiya li pêşiya xwe ji holê rakin û bi vî rengî projeyên xwe pêk bînin. Rastiya vê projeyê jî weke raberkirina hêzên global li Rojhilata Navîn bicihkirina Nîzama Cîhanê ya Nû ye.

Hêzên sermayeya global pergala ku li Rojhilata Navîn bidin rûniştandin û ji bo pratîzekirina Projeya Rojhilata Navîn a Mezin girîngiyeke mezin didin faktora kurd, roleke stratejîk ji bo wê diyar kirine. Êsîr girtina Rêber Apo û vekirina pêşiya hevkaran di rastiya encameke wiha de derketiye holê.

Êsîrgirtina Rêber Apo û şert û mercên ku tê de tê girtin di encameke wiha de çêbûne. Pergala avakirina bi navê Rejîma Îşkenceyê ya Îmraliyê jî pêkanîneke bi vî rengî ye. Rêber Apo di hundirê vê pergalê de, bi her awayî ji civakê hatiye îzolekirin û bi demê re hatiye xwestin ku bê qetilkirin. Lê berxwedana Rêber Apo û têkoşîna Hêzên Azadiya Kurdistanê lîstikên ku hêzên sermayeya global xwestin bilîzin pûç kir.

Berxwedana Rêber Apo ne tenê aliyê wate û çawaniya siyasî ya dema Komploya Navneteweyî deşîfre kir, aliyê felsefîk û dîrokî yê komployê û di piştperdeya wê de çi heye deşîfre kir. Ev yek bi her awayî tê wateya berxwedaneke li hemberî nûnerên îro yên stemkarî û desthilatdarî ya dîrokî. Ji ber vê yekê, Komploya Navneteweyî di roja 15'ê Sibatê de bi esareta Rêber Apo encam bû. Bi pêş ketiye û şîdeta wê her çûye zêde bûye. Ev yek heta roja me ya îro berdewam kiriye. Şertên îro yên Rêber Apo di nava Pergala Îşkenceyê ya Îmraliyê de tê hiştin encama rastiyeke wiha ye.

Rêber Apo bi parêznameyên xwe yên nû bi her awayî analîza civaka dewletparêz ya desthilatdariyê kiriye û bingeha manîfestoya civaka demokratîk komunal çêkiriye. Di rastiyê de jî şertên niha yên Rêber Apo di nava pergala Îmraliyê de tê hiştin ku ji berê xirabtir bûye ev rastî heye. Hêzên sermayeya global ku ji berxwedana Rêber Apo, nêrînên wî yên felsefîk û ramanî ditirsin, li hemberî vê tekane riya çareseriyê di girankirina şertên jiyana wî de dîtine. Ji ber vê yekê şertên îzolasyonkirinê hêj bi awayekî teniktir pekutiyên xwe zêdetir dikin.

Rêber Apo şertên jiyanê yên nû ku di nav de tê hiştin weke "Çala mirinê" bi nav kir. Ev Komploya Navneteweyî di şexsê Rêber Apo de nîşaneya ku şêweyekî nû girtiye pêş ketiye. Şêweyên pêkanîna Komploya Navneteweyî ya di pêvajoyên berê de; berxwedana Rêber Apo, xwedîderketina gelê me ya li Rêber Apo û têkoşîna wê, ji nû ve xwe avakirina hêzên demokrasî û azadiyê û gihîştina hêza biryarbûneke mezin ev yek pûç kir. Şêweyê nû yê Komploya Navneteweyî ku di şexsê Rêber Apo de tê pratîzekirin jî dê bêne pûçkirin. Gelê me xwedî derketina li Rêber Apo dê berxwedana xwe mezintir bike.

Pêvajoya ku em ketine ji serdemên din taybetiyên hêj talûketir dihewîne. Tasfiyeya li hemberî têkoşîna azadiya gelê me bi rêbazên tenik hêj zêdetir tên meşandin. "Çala mirinê" ku Rêber Apo xistinê jî gaveke ku di vê hêlê de hatiye avêtin îfade dike.



# Rolên kambax û Ocalan

**Ji ber çar rastiyên bingehîn ên birêz Ocalan, rastî reşkirinên sîstematîk û biryarên polîtîk tên. Li gel van êrîş û reşkirinan jî birêz Ocalan di nava dilê gelê xwe de cih girtiye**

MAHABAD ARDA

Tu kes bi qasî birêz Abdullah Ocalan wiha sîstematîk û bi biryarên polîtîk nehatiye reşkirin. Lê dîsa tu kes jî, bi qasî wî, li gel van êrîş û reşkirinan jî, di nav dilê gelê xwe de cih negirtiye.

Demek, herî zêde, di mijara nêzîkayiya wî ya jinan de pir zêde reşkirin, nebû û êrîş hatin kirin. Hin kesên di bin kontrola dewletê de, rabûn pirtûk jî nivîsîn. Lewra Ocalan ji hemû peyamber û fîlozofan bêtir û kûrtir nêzî pirsa jinê bû. Di daxistin, bêkesayetkirin û tunekirina jinê de, daxistin, bêkesayetkirin û tunekirina civakê dît. Ocalan rahişte çi û di ku de bi pêş ket, hêzên tarî, dijminên tevgera azadîxwaz û loqoyên wan, di wir de êrîş bi ser Ocalan ve birin.

Herî dawî di mijara Egenekonê de, dîsa pir sîstematîk û bi biryarên polîtîk, hin derdoran dane axaftin, bi wan dane nivîsîn, propagande kirin. Hin malper, li gel bi dehan nûçe û nivîsên manîpulatîf û derew, bi ser de anketan jî kirin ku gelo Ocalan mirovê Ergenekonê ye an na. Bêyî rastiya ku Ergenekon bi xwe jî, dîsa bi saya serê Ocalan û nêzîkayiyên wî yên polîtîk deşîfre bû, bibînin. Armanc kuştina rezvan e. Kî bixwaze çi bibîne, çawa bibîne, wê dibîne û wisa dibîne. Di vir de niyetên subjektîf, hesabên ferdî ne yên xwe didine der, ne rastiyên jiyanê ne!.. Û ev di bin navê "welatparêziya resen" de têne kirin. Ez ê bême ser wê mijarê jî.

Di van de, li gorî min çar rastiyên bingehîn derdikevine holê: Yek jê hêz û mezinahiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Lewra li gel van hemû êrîşan jî, bi felsefe û fîlozofiya xwe ya kûr, bi rawestana xwe, girêdana xwe ya mezin a bi nirx û rûmetên mirovahiyê û azadiyê ve, bû Dîcle û Firat di nav dilên çolkirî de. Axên ziwabûyî û qelişî hatin avdan û êdî şîn bûne, kulîlk vedidin. Ji lewre ye ev girêdana mezin a bi Ocalan ve. Gel dema navê wî diqîre, xwe bêtir azad hîs dike û digihêje çêja azadiyê. Lewra di kesayetiya wî de, pêşeroja xwe ya azad dibîne. Di tu demên dîrokê de û di nav tu civakî de, gelek, bi vî rengî, bi serokê xwe ve nehatiye girêdan. Ji bo tu peyamber an serokekî, tu kesekî xwe neşewitandiye.

Ya duduyan: Yên di çarçoveya êrîş û reşkirinên sîstematîk û polîtîk ên bi taybet DYA û dewleta tirk de êrîşê Ocalan dikin, ne vala ne!.. Ez behsa kesên ku di bin bandoran de dimînin û bi hestyarî û nezanî êrîşan dikin, nakim. Ji xwe hejmara wan jî ne zêde ye. Lê ez behsa kesên mîna Kemal Burkay, Yaşar Kaya, Îbrahîm Guçlu, Selîm Çurukkaya, Şemdîn Sakik, Umît Firat, Şerafettîn Elçî û sazî, dezgeh, partî, rêxistin û weşanên nêzî wan dikim. Angaşta çi bikim, ez ê wê vekirî bêjim û tenê dibêjim ku polîtîkaya van kes û derdoran, angaştên wan ên bê binî û pûç û vala, nêzîkayiyên wan ji têkoşîna azadiya gelê kurd re û rawestana wan a jiyanê balkêş in û bêtir nêzîkî daxwaz û polîtîkayên hêzên li dijî tevgera azadiya gelê kurd in. Tenê ji destpêka wan ve mirov li helwest û kiryarên wan bikole, dê mirov çêtir û zelaltir bibîne. Ya herî grîng jî, tu kesekî ji wan, tu berdêlên giran nedane. Piraniya wan dewlemend in, ji welat ev 30-40 sal in dûr dijîn, an jî jiyan û piştre ji bo qaşo "siyaset" bikin vegeriyan.

Lê gelo kesek difikire ku ka çima dewletê hin karsazên kurd bi angaşta ku nêzî PKK'ê ne dikuştin û di heman demê de îhale didane hin karsazên kurd ên "welatparêz"? An çima sempatîzanek PKK'ê dema ji Ewropayê biçûna, dihate girtin, îşkencekirin, hinan bi salan di girtîgehan de girtin, lê hin kesên ku serokatiya rêxistinên îlegal dikirin û qaşo dozên mezin dikirin, lê milê xwe hejandin û çûne welat. Ew kes tew ji her kesekî bêtir tûjtir diaxivin, kesekî naecibînin, bi vir de wir de êrîşan dikin û êvarê diçine mala xwe, li ser serê rehet. Ev çawa dibe gelo? Du pirsên pir biçûk in ev, hîn dikarin bi dehan pirsên wiha bêne kirin.

Ya sisiyan ev e: Di her demên dîrokê de kesên ku rastiyan anîne ziman û li gorî wan rastiyan jiyane, di dema xwe de bi taybet, timî hatine kevirkirin, çamûrkirin, zîndankirin, îdamkirin, bijehrkirin û heta şewitandin û gurandin. Bi dehan mînakên wiha hene di dîrokê de, lê yek mînakeke bi tenê jî tune ku ev kes ji ber sedemên rast û di cih de ev zilm dîne û van zilman heq kirine. Dijberî vê, yên ku ev zilm li van kesan kirine, timî hatine lanetkirin ji aliyê mirovahiyê ve. Niha kesek navên wan zaliman jî nizane, tenê navê zilma wan maye. Lê yên zilmê dîne; Sokrat, Brûno Guardian, Hallacî Mansur, Galîle û bi sedan yên mîna wan heta mirovahî hebe dê bi hezkirin û minet bêne bibîranîn.

Ya çaran û ya herî girîng: Eger birêz Abdullah Ocalan ne kurê gundiyekî jar û ji rêzê bûna, lê ji malbateke dewlemend, axa, şêx, an arîstokrat hatibûna, dê gelek kesên ku niha êrîş dikin, kêmasî hinek din bi sînor û pîvan bûna. Yek ji sedemên herî girîng ên van êrîş û dijayetiyên gemar jî, ev biçûkdîtin e. Ango ev kompleksa mezin a kambax a wan e. Lewra ew bi filanbinîbêvaniya xwe ve di nav civaka kurd de nebûne tu tiştek, lê kurê Omerê 'jar', 'xizan', 'bêkes' û 'nezan', çawa dikare bibe Serok û ew dê çawa bikaribin bi wê xezeb û kompleksa nava xwe bikaribin wî mîna Serok bipejirînin.

Li dîroka me binihêrin; serokên me timî mezinên eşîran, beg, axa, şêx û arîstokrat bûne. Yekem car e di dîroka me de kurê gundiyekî jar û xizan wiha bilind dibe û ji hemû serokan bêtir tê hezkirin. Ya herî grîng jî, tiştê ku tu serokekî kurd nekiriye an nekariye bike, birêz Ocalan kiriye. Hemû cudahiyên olî, mezhebî, heta zayendî li hev kom kirine, ew bilind kirine, bi rûmet kirine, wan li dora yek armancî kom kirine û gel jî, li dora wî, bi girêdan û germahiyeke bêhempa kom bûye. Hema yek mînakek bi tenê: Dema kurdek misilman, kurdek êzîdî dibîne, êdî nema ne dikuje û ne jî ya herî xirab, tuf dikê. Di milê hev de ne, bi hev re şehîd dibin, bi hev re govend digerînin, bi hev re diqîrin, bi hev re digirîn, bi hev re têdikoşin ji bo pêşerojeke azad. Ev bi serê xwe şoreşeke mezin e û ya ku ji aliyê van derdoran ve nayê daqurtandin û ji ber wê jî vedireşin, ev in… Ew qasî giran tê ji hinekan re ku êdî ne girîng e ji bo wan ka di çemê dijmin de avjeniyê dikin, an bi kiryarên xwe xizmeta polîtîkayên dijmin dikin.

Yên herî zêde bi dengê bilind dibêjin 'Kurd' û 'Kurdistan', yên herî 'dilsoz' û 'welatparêz' ew in!. Lê yên qet bedêl nedane, êş nekişandine û li ser zikê têr û serê rehet radizên jî her ew in!..

Ev rastiya kambax di her civakê de heye, ne tenê di nav me de. Mînaka herî balkêş jî tirk bi xwe ne. Binihêrin; yên ku herî zêde diqîrin "Vatan, Millet, Sakarya', nijadperestên herî tûj û sereke, yê bi vir de wir de êrîşan dikin, provakasyonan dikin ew in, lê yên ku qet bedêl nedane, herî zêde ranta vî şerî bi dest dixin û naxwazin ev şer bi dawî bibe jî, ew in û dema li wan teng dibe, yên herî zû hemû nirxan difiroşin û direvin, dîsa ew in. Yên me jî heman mînak in. Tu ferqa wan ji hev tune.

Yên ku di çavên gel de demekê filanbinîbêvan bûn û bi erzanî Koçero bûn, bi derketina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re, erzaniya wan û netutiştiya wan aşkera bû. Ocalan nîşanê dost û dijminan da ku ev doz dozeke mezin û giran e, divê bedêlên wê jî giran bin, bi erzanî dozên giran nikarin bêne ragirtin, ev xapandin e û xweerzanjiyandin e. Ev kîn û xezeba wan derdoran ji ber van hemû sedeman in.

Ev şer şerê Prometheus û Xwedawendên gemar û tolaz e. Di vir de aliyê mirov pir girîng e. Niyet, armanc û daxwaz in yên aliyan diyar dikin. Ev ne rastiya kesekî ye, rastiya jiyanê ye.

Em dîsa gotina me ya pêşiyan bi bîr bînin: BERXÊ NÊR LI BER KOZÊ KIFŞ E! *(amîdakurd.com)*

ROJEV

**Zozan Basın Yayın Adına**
**İmtiyaz Sahibi:** Eser UYANSIZ
**Yazı işleri Müdürü:** Mustafa AGGÜL

**Yönetim Yeri:** Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No: 9
Kayapınar / DİYARBAKIR
**İdare Tel:** 0 (412) 251 38 88
**Yayın (Weşan)**
**Tel:** 0 (412) 237 48 91
**Fax:** 0 (412) 237 48 89
**Baskı(Çap):**
**Stenbol:** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
**Edene:** Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44 Seyhan/ ADANA
**Yaygın Süreli Yayındır**

## Qeyda dengê kujerê du DTP'iyan Zekî Akdogan derket holê

### Diyaloga ku mirov matmayî dihêle

***DI QEYDA*** deng a Akdogan de bûyer ji aliyê kê ve hatiye kirin, çima kirine û koma ji 15 kesan pêk tê çawa şopa xwe winda kirine hemû tişt bi awayekî aşkera derdikeve holê. Tomara deng wiha ye:

**Zekî Akdogan:** Yanî min ev bûyer kir û veşart. Riha tu kesî hajê nebû. Lewma dewlet li gel me ye. Çimkî agahiya yên din jê tuneye.

**X:** Ez dê pirsekê ji te bikim, lê bila tu guman, an jî tirs nekeve dilê te. Ya min tenê meraq e. Ma sûcê van her du mirovan çi bû? Ma xayîn bûn, an ji bo pere bû? An jî sûcê wan yên din hebûn?

**Zekî Akdogan:** Na na ji bo pere ne, fermana wan ya mirin 2 sal berê hatibû dayîn yanî dosyaya wan 2 sal berê hatibû amadekirin. Lewma her du jî ji partiyê bûn. Biryarê wê ji bo ROJ TV'ê axivî bû û der heqê fermandarekî Qereqola Çemanê de axiftibû. Behsa gefan filan kiribû. Yek jî ev her du dema ku roja Bexbirê sibê diçine Berxbirê bi Fermandarê Qereqola Çemanê nîqaş kiribûn. Fermandarî gotibû wan neçin Bexbirê. Wan jî gotibû em ê biçin. Li ser vê Fermandarî gefa 'Dema ku hûn biçin hûn ê bibînin' li wan xwaribû. Ev jî çûbûn. Piştre jî agahî hatedê vê bûyerê bikin.

**X:** Yanî agahiya dewletê jê hebû?

**Zekî Akdogan:** Erê erê ma agahiya dewletê pê nabe?

**X:** Lewma me digot dewlet bixwaze dê telefonan guhdar bike û bi awayekî lezgînî bûyerê çareser bike. Teqez agahiya dewletê jê hebû.

**X:** Piştre hevalên te çûn kîrê. Ma çûne qereqolê?

**Zekî Akdogan:** Ew çûne Derê Avê û bi koma din re hatin cem hev û çûn.

**X:** Li noqtaya kontrolê derbasî qerqolê bûn. Yanî dewlet kî kîjan saetê li ku derê derbas bûye dizane. Dema ku wesayît ji noqteyên kontrolê derbas dibin tên qeydkirin.

**Zekî Akdogan:** Agahiya dewletê pê heye. Me li ber çavan nagire. Di ekîba me de mirov heye. Dema ku noqteyên kontrolê kaxizekê nîşan dide û em derbas dibin. Tu kes pirsa me nake û me ranawestîne. Mirovê li gel me yekî wisaye.

**X:** Ma şopa tiliyên we di wesayîtê de nama? Ma we destik bi kar anîn?

**Zekî Akdogan:** Na min tu tişt bi kar neanî. Di demeke kin min bi kar anîn. Nizanim.

**X:** Yanî tu dibêjî agahiya dewletê pê hebû.

**Zekî Akdogan:** Dema ku agahiya dewletê pê tunebe tu kes nikare bûyerên wisa bike.

# 'Fermana kuştinê Qereqola Çemanê da'



**Dengê Zekî Akdoganê bi sedema tevli qetilkirina du DTP'iyan bûye hatibû girtin, derket holê. Deng beriya Akdogan biçe leşkeriyê dema li ser mijarê sohbet bi hevalekî xwe re kiriye hatiye qeydkirin. Akdogan detayên qetilkirinê yek bi yek vedibêje. Ji deng tê fêmkirin ku Akdogan navên qatilên rastîn di îfadeyên xwe de negotine**

Têkildarî qetilkirina endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş tomara deng a kiryarên bûyerê Zekî Akdogan hate bidestxistin. Di tomara deng a Akdogan de tê diyarkirin ku qetilkirina Olmez û Edîş ne ji bo pereyan, ji ber ku DTP'î ne pêk hatiye. Akdogan, anî ziman ku roja Mîhrîcana Berxbirê serê sibê bi Fermandarê Qereqola Çemanê re nîqaş kirine û ji ber vê yekê fermandarê qereqolê jî gefa "Dema ku hûn biçin hûn dê bibînin" li van kiriye. Piştre jî tê gotin wan biryar qetilkirina Olmez û Edîş daye. Di tomara deng ya Akdogan de tê destnîşankirin ku qetilkirina Edîş û Olmez bi agadariya dewletê pêk hatiye.

Têkildarî qetilkirina endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş delîla bûyerê ronî dike hate bidestxistin. Tomara dengê endamê "Tîma Xençer" Zekî Akdogan ya têkildarî qetilkirina endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş, hate bidestxistin. Di tomara dengê Zekî Akdogan de tê diyarkirin ku Tîma Xencer bi agahdariya dewletê Olmez û Edîş kuştine. Di 25'ê tîrmehê de li navçeya Elkê endamên DTP'ê Necman Olmez û Ferhat Edîş dema diçûn Mîhrîcana Berxbirê ya Elkê hatin qetilkirin. Piştî bûyerê hate angaştin ku bûyer ji aliyê 15 endamên Tîma Xençer ve pêk hatiye. Her çiqas welatiyên herêmê û parazvanên mafên mirovan destnîşan kirin ku bûyer ji aliyê "Tîma Xençer" ve pêk hatiye û xwestin bûyer zelal bibe jî heta niha rayedarên dewletê têkildarî Tîma Xencer tiştek nekiriye.

<u>'Hevalê wî dengê Akdogan qeyd kir'</u>

Piştî bûyerê hevalekî Endamê "Tîma Xençer" Zekî Akdogan, bi awayekî veşarî têkildarî bûyerê bi Akdogan re sohbetê dike û dengê wî tomar dike. Di vê qeyda hate bidestxistin de gelek agahiyên bûyerê zelal dikin derdikevin holê. Di tomara dengê Endamê "Tîma Xençer" Zekî Akdogan, ku piştî bûyerê hate girtin û niha li Girtîgeha Leşkerî ya Amedê girtî ye, hemû aliyên bûyera qetilkirina endamên DTP'ê Olmez û Edîş ronî dibin. Di tomara deng de, kî, çawa, çima Olmez û Edîş qetil kirine û piştî wê plansaziyên wan çi bû hemû cih digire. Li gorî agahiyên tomarê, hat gotin ku ji ber Olmez û Edîş di sala 2008'an de beşdarî ROJ Tv bibûn û diyar kiribûn ku fermandarekî Qereqola Çeman gef li wan xwariye dosya wan a kuştinê hatibû amadekirin û fermana kuştina wan ji aliyê Qereqola Çeman ve hatibû dayîn. Piştî bûyerê birayê Ferhat Edîş Nîhat Edîş jî, ji DÎHA'yê re axivîbû û diyar kiribû ku di sala 2008'an de birayê wî ji aliyê Serdarê Qereqola Çemanê Çoşkun û Serbaz Qereqolê Sinan ve rastî gefên mirinê hatibû.

<u>'Ekîba me ji 15 kesan pêk dihat'</u>

Di tomara dengê Akdogan de hate gotin ku dosya kuştina Olmez û Edîş 2 sal berê ji aliyê Qereqola Çeman ve hatibû amadekirin û dema Olmez û Edîş roja Mihrîcana Berxir a Elkê diçûn elkê di rêde bi rayedarekî Qereqola Çeman re niqaş kirine û piştî niqaşê leşkerê rayedar gotiye "Hûn biçin hûn dê bibînin". Akdogan, dibêje piştre rayedarên qereqolê farmana kuştina Edîş û Olmez daye wan. Akdogan, di tomara deng de dibêje ku di nava tîmê ji 15 kesan pêk tê 4 endamê eşîra Babat ku niha cerdevanin û 4 kes jî ji Mala Beyrê hene û rêbertiya tîm dikin. Akdogan di tomara deng de têkildarî qetilkirina Olmez û Edîş wiha dibêje: "Me çar kes li Derê Avê danîn. Me kesek jî ji bo çavdêriyê li ber dîrekê şebekeyê danî. Em 10 kes çûn cihê ku em bûyerê pêk bînin. Ez bi telefonê bi wan re axivîm min got 'Dema hûn hatin erebeya xwe li Dûvê Botê bisekinînin û derkevin jor, 100 - 145 karên me hene werin ez bifroşim we' Piştre hatin û min bi gotina 'Hûn bi xêr hatine' pêşwazi kirin. Piştre em li bin darê rûniştin. Ciqare û kola jî anîbûn. Me hinekî sohbet kir. Gotin 'ka kar li kune?' Min jî got 'li pişta zinarin diçêrin' wan jî got 'Ka çenteyên we li kune?' Min jî got 'Şivanan bi xwe re birine' westiyabûn. Yekî xwe dirêj kir. Bawerim bêxew bûn."

<u>'Fêmkirin ku em ê wan bikujin'</u>

Zekî Akdogan di sohbeta xwe dibêje ku Edîş û Olmez guman ji wan kiriye û xwestine çekê bi dest bixin. Akdogan wa deqîqeyên dawî wiha vedibêje: "in dît ku wê ji me têkevin şikê min agahî da hevalê xwe. 3 kes hatin. Ketin şikê. Yekî li hevalê min nerî û got 'Ev çi çekek xweşik e. Ez dikarim lê binerim?'. Lê hevalê min çeka xwe nedayê. Armanca wî çek bi dest bixistaya. Armanca me fam kiribû. Min çav da hevalê xwe û Hevalê me bi hevre gule berdan wan. Deng ji yekî derneket, yê din rabû ser xwe û bimere şer kir. Gelekî gir bû. Me tevan bi kêran êrîşî wî kir. Ket xwar. Piştre me ew daxistin xwar û bi keviran serê wan perçe kirin. Piştre jî me qirş û qal avêt ser wan. Piştre dolmîş hat û hevalên me li dolmîşê suwar bûn û çûn. Piştre kesên li Derê Avê jî xistin dolmîşê û çûn. Ji min re gotin wesatiya wan bavêje dolê. Piştre ez jî çûm li wesatiya wan suyar bûm û min bi tirs ajot. Ji ber ku ez bi lez çûm erebeyê vîraj derbas nekir û ket newolê. Piştre min çeka xwe girt û ez ji wir dûrketim."

<u>'Me dê cînayetên din jî bikirina'</u>

Akdogan di tomara deng de diyar kir ku wan dê li Gundê Pîrozhanê bûyerên din çêkira û wiha dom kir: "Piştî bûyerê ez hatim Gundê Pîrozhanê. Me dê bûyerên din çêkira. Min got hîn ev bûyer nû ye baş nabe. Min got bi me bihisin baş nabe. Di vegerê de em çêkin. Biştre bi lez û bez ez çûm nava rezan, dol û dol çûm Pirozhanê. Ji bo em şik û gumanan çênekin, ez ji aliyê din ve ketin nava gund. Di ketina gund de min Sabramoglu Huseyîn dît. Ez sekinîm ku biçe. Piştî ew çû ez ketim nava gund. Min derdor guhdar kir. Min dît ku bûyer hatiye bihîstin."

<u>Navên kujerên rastîn nedan dadgehê</u>

Zekî Akdogan beriya ku biçe leşkeriyê telefonên Necman Olmez û Ferhat Edîş dan hevsera xwe. Piştî demekî hevsera wî bêpere dimîne û telefonan difiroşe û li ser vê yekê telefon deşîfre dibin ka li cem kê ne. Piştî hevsera Akdogan hate girtin rastî derket holê. Akdogan li leşkeriyê tê binçavkirin û ji malbata wî re telefon tê ku wî li leşkeriyê întihar kiriye. Piştre jî wî digirin û tînin Silopiyê. Balkêş e ku Akdogan şûna ku navên kesên di qeyda deng de behsa wan kiriye bide, navên xizmên xwe di îfadeyên xwe de daye. ŞIRNEX (DÎHA)

# Li Dîmê 42 PKK'î bi komî hatine veşartin

Li gundê Dîmê yê navçeya Bêgiriya Wanê gorek tomarî ya aîdî 42 PKK'iyan e hate dîtin. Şahidan daxuyand ku pevçûn di sala 1994'ê de li Çiyareşkê yê Çemê Hecîbegê ku dikeve navbera gundên Tûzik û Duavê qewimîbû û yek jê jin 42 PKK'iyan jiyana xwe ji dest dabû.

**Bi helîkopterê anîn gund**

Şahidan daxuyandin ku cenaze piştre bi helîkopter û minîbusên sivîlan birine gundê Dîmê. Li gorî agahiyan cenaze bi helîkopteran avêtin nava meydana gund. Li gorî agahiyan piştî cenaze rojek li vir jî li nav gund hatine hiştin, piştre li jêrahiya goristana gund bi kepçeyê cihek hate vekirin û PKK'î hatin veşartin. Hate daxuyandin ku di heman deman de 3 endamên din ên PKK'ê ku jiyana xwe ji dest dabûn, anîne heman cihî û bi komikî veşartine. Bi van 3 kesan hejmara PKK'iyên di heman gorê de derketine 45'an. Gundiyan anîn ziman ku PKK'iyek din ê di pevçûnekê de birîndar ketî dest jî hatiye înfazkirin û li hewşa qereqolê hatiye veşartin. Leşkerên dixwazin pêşiyê cenazeyan li nav ziblên leşkeriyê veşêrin rastî nerazibûna gundiyan tên. Rûspiyê gund Şaban Gur bi rayedarên leşkerî re diaxive û dixwaze ku PKK'î li nêzîk goristana gund bên veşartin. Li ser vê yekê PKK'î li nêzîk goristanê tên veşartin. Hate angaşin ku cenazeyên gundiyan heta goristanê birine, bi tevahî hatine perçekirin. Gundiyan daxuyand ku li cenazeyan tu şopên guleyan tunebûne û tevahiya guh û tiliyên wan jî jê hatine kirin. Gundiyan derbirî ku dest û piyên gelek cenazeyan jî jê hatibûne kirin. Gundiyan got ku piraniya gul û tiliyên PKK'iyan wekî hediye jê hatine kirin û bi serê şervanan wêne hatine kişandin.

**Leşkeran agahî piştrast kirin**

Leşkerekî ku di sala 1994'an de li gundê Dîmê yê navçeya Gurpinarê leşkerî kirî û di nava pevçûnê de cîh girtibû, pevçûna wê rojê û bûyerên piştî pevçûnê qewimîn wiha vegot: "Min wê demê li herêmê leşkerî dikir. Roja pevçûnê em çûbûn gundekî din me lêgerîn dikir. Lê li wir ji me re bi telsîzê ragihandin ku li wir pevçûn derketiye û ragihandin ku ustegmenek û 2 leşker mirine. Em ber bi cihê pevçûn lê qewimiyê ketin rê. Dema em diçin wir hîna jî pevçûnê dom dikir. Cihê pevçûn lê derketibû qadek rast bû. Li her derê leşkeran gule berdidan û 2 balafir jî difiriyan. Piştî saetan ji gotin ku tevahî kom kuştine. Piştî pevçûnê cenaze rojekê li cihê bûyerê hatin hiştin. Cenaze piştî rojekê li pişta hesp û hestiran girêdan û hata gundê Tûzekê kaş kirin. Ez jî çûm ser cenazeyan. Li ser hind cenazeyan şopa guleyan nîn bû. Li ser hina jî şopên reş ên şewitî hebûn. Gundiyên ku li wir jî diyar kirin ku di dema bûyerê de madeyên kîmyasal hatine bi kar anîn." Endamê DTP'ê Siddik Gul ku dema bûyerê li gund bû jî bûyer wiha vegot: " Ez wê demê li gund bûm. Dema ez çûm ser cenazeyan min dît ku li ser wan şopên guleyan nînbû. Li ser laşê wan nokteyên reş û şopên şewatê hebûn." Gul, anî ziman ku li ser cenazeyan tahrîbat hatibûn kirin ew nedihatin naskirin. wiha got: "Leşkeran guhê endamên PKK"ê yên mirî jêdikirin û wêne dikişandin. Li ser vê yekê min bi subayekî li wir hevdîtin çêkir. Piştre leşker hişyar kirin." Cenaze li ser israra gundiyan li nêzî goristanê hatin veşartin. WAN



# ‘Rê li ber komkujiyê vedikin’

## Serokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê anî ziman ku piştî îşkence, jehrdan û êrîşên fizîkî li hemberî Rêberê Gelê Kurd Ocalan gavên ji bo jiholêrakirinê hatine avêtin û banî gelê kurd kir ku li hemberî vê yekê rabe ser piyan

Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK), der barê tecrîda giran ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, destpêka pêvajoya nû bi nav kir û got ku di şexsê Rêber Apo de, dergehê komkujiyên li dijî gelê kurd hatin vekirin.

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê destnîşan kir ku, desthilatdariya AKP’ê, dibin navê cih guhertinê de, pêvajoya jiholêrakirinê da destpêkirin û got: “Ev darbeyek e. Bi vê darbeyê, pêvajoyeke nû dane destpêkirin. Desthilatdariya AKP’ê, dixwaze ku Rêber Apo ji holê rake. Guhertin, navê xapandina gelê me ye. Pêwist e her kes li hemberî vê pêvajoya talûke şiyar be û bêdeng nemîne.”

**‘Xeleka dawî xistin dewrê’**

KCK’ê, bal kişand ser serdanên CPT’ê ya Îmraliyê û got: “Guhertina cihê Rêber Apo, li ser pêşniyarên CPT’ê pêk hatiye, lê guhertin ne ji bo başiyê, ji bo kuştinê pêk hatiye. Serokatiya me, 11 sal in dibin hoy û mercên herî giran û dijwar de tê girtin. Îşkence, jehrdan û êrîşên fizîkî pêk hatin. Kiryarên li dijî Rêber Apo tenduristiya wî xera kirin. Guhertina dawî jî, tê wateya cezayê hucreya berdewamî û xeleka dawî jiholêrakirinê.”

KCK’ê da zanîn ku Rêber Apo, ne girtiyekî ji rêzê ye û got: “Tenduristî, ewlekarî û azadiya Rêber Apo, tê wateya tenduristî, ewlekarî û azadiya gelê kurd. Di heman demê de, rewşa paşeroja Tirkiyeyê jî destnîşan dike. Me, wek Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd, gelek caran diyar kir ku nêzîkbûna Rêber Apo, nêzîkbûna tevgera me û gelê me ye. Nêzîkbûna Rêber Apo, tê wateya şer û aştiyê. Baş tê zanîn ku li ser banga Rêber Apo, hêzên gerila derketin derveyî sînorên Tirkiyeyê, biryara 'bêçalakîtiyê' hate dayîn û herî dawî, li ser banga Rêber Apo, Komên Aştiyê çûn Tirkiyeyê. Ev nîşaniyên dilsoziya Rêber Apo ya aştîxwaz û çareseriya demokratîk e.”

Serokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê, destnîşan kir ku, ev darbe li dijî hewldanên Serokatiya me, tevgera me û gelê me ya projeya aştiyê ye. Ev dijberî gav bi gav û dibin pêşengiya serokwezîrê Tirkiyeyê Erdogan de pêk hat. Rêber Apo, ji bo aştiyeke mayînde û çareseirya demokratîk kedeke mezin da. Lê dewleta Tirkiyeyê bi hêzên leşkerî, burokratîk û dadgeriya xwe dijminatiyeke dijwar da meşandin. Li metropolan li dijî gelê me êrîşên lincê dest pê kirin. Ev tê wateya ku pêvajoya ji holê rakirinê dane dest pê kirin.”

KCK’ê dazanîn ku desthilatdariya AKP’ê û dewleta tirk, li hemberî bang û hişyarkirinên gelê kurd, sazî û dezgehên mafên mirovan û demokratîk teva bêdengiya xwe didomîne û got: “Desthilatdariya AKP’ê jî di nav de, rayedarên dewletê, sazî û dezgehên fermî yên dewletê bi agir dilîzin. Pêwist e dereng nemînin û tenduristiya Rêber Apo ewle bikin, hoy û mercên wî baş bikin. Bila kes bi sebra gelê me û tevgera me ne lîze.”

**Banga ji CPT’ê...**

KCK’ê, bang li CPT jî kir û dereng nemîne û got: “Girtîgeha nû û guhertina cihê Rêber Apo li ser pêşniyar û daxwaza CPT’ê pêk hatiye, pêwist e CPT dereng nemîne û di demeke zû de, dest dane ser pirsgirêkê û tedbîrên pêwist û lezgîn bigire.”

KCK’ê bang li sazî û dezgehên tenduristiyê, sazî û dezgehên demokratîk, sosyalîst, aştîxwaz û mafên mirovan jî kir ku li dijî kiryara dewleta tirk bêdeng nemînin.


KCK’ê, bang li gelê tirk jî kir ku, siyasetên li dijî Rêber Apo têne meşandin, di heman demê de, li dijî gelê tirk e jî û got: “Ev rewşa dawî wê bandorê li demokratîkbûna Tirkiyeyê û paşeroja Tirkiyeyê teva bike. Lewra em bang li eniyên humanîter, demokrat û aştîxwaz û bang li gelê tirk jî dikin ku li dijî vê siyasetê dengên xwe bilind bikin û ji bo aştiyeke mayînde, jiyaneke hevpar ya wek hev û Tirkiyeyeke demokratîk têbikoşin û hevkariya gelê kurd bikin.” KCK’ê desnîşan kir ku pêvajo awarte ye, jiyana Serokatiya gelê Kurd di telûkeyê de ye. Pêwîst e her kurdê bi rûmet, li dijî vê helwestê dengê xwe bilind bike. **BEHDÎNAN (ANF)**

## Bombeyên gazê avêtin malan

***LI NAVÇEYA*** Geverê ya Colemêrgê bi mebesta 31’emîn salvegera damezirandina PKK’ê çalakiyên pîrozbahiyê pêk hatin. Lê polîs texamulî pîrozbahiyê nekir û mudaxaleyê gel kir. Di dema pevçûna di nav gel û polîsan de, polîs bombeyên gazê avêtin du malan.

Roja yekşemê li taxa Esentepeyê ya Geverê bi sedan ciwan li ber Pirêya Abdullah Canan civiyan, agiran vêxistin û diruşimên wekî “PKK gel e, gel li vir e”, “Bijî Serok Apo” û “Bêyî Serok jiyan nabe” berz kirin. Polîs bi gazên îsotê êrîşî ciwanan kir. Di dema êrîşê de, polîs bombeyên gazê avêtin malên welatiyên bi navê Yunus Yapalak ve Sefer Baltaci. Di encamê de zarokek 7 mehî jî di nav de 17 kesên di malan de bandorek mezin ji bombeyên gazê girtin.

Malbatên Yapalak û Baltaci ku li ser êrîşa polîsan malên xwe vala kirin, li dijî vê yekê nerazîbûn nîşan dan. **COLEMÊRG**



## Li her derê çalakî pêk tên

Li dijî girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li gelek herêmên Kurdistanê û Tirkiyeyê gelê kurd rabû ser piyan û çalakiyên şermezarkirinê li dar xistin. Di çalakiyan de, di navbera polîs û gel de pevçûn derketin. Ciwanên kurd, her der wergerandin qada şer. Çalakiyên li hin bajaran wiha ne:

***STENBOL:*** Li Stenbolê komeke ciwanan di çalakiyên şermezarkirina girankirina li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de, molotof avêtin şaxeke PTT’ê û otobuseke ÎETT’ê.

Komeke ciwanan li taxa Guvercintepeyê civiyan. Ciwanan bi durişiman tecrîta li ser Ocalan şermezar kirin û moltof avêtin taxa PTT’ê ya Bayramtepeyê. Di encamê de, di PTT’ê de xesareke mezin a madî pêk hat. Piştî ku polîs hatin taxê di wan û ciwanan de pevçûn derket û ciwanan çalakiya xwe bi dawî kirin.

Li taxa Sultanbeyliyê jî ciwanan molotof avêtin otobuseke ÎETT’ê. Ciwan li ceda Antalyayê sekinin û dû rê otobusê dan sekinandin. Ciwanan kesên di otobusê de peya kirin û paşê jî bi molotofan agir berdan otobusê dan. Di encamê de, di otubusê de xesareke mezin pêk hat û êdî otobus ket rewşa ku nayê bi kar anîn. Di çalakiyê de tu kes birîndar nebû yan jî nehat binçav kirin. Komeke ciwanan jî li taxa Okmeydaniyê çalakiyek li dar xistin. Ciwanan bi molotofan rê girtin û trafîkê asteng kirin. Paşê jî di di nav ciwan û polîsan de pevçûn derket. Di pevçûnê de ciwanan molotof avêt erebeya polîsan a ku bi navê ‘Akrep’ tên nasîn û erebeyê şewitandin.

***GEVER:*** Li navçeya Geverê ya Colemêrgê bazirganan bi mebesta şermezerkirina girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kepengan girt û gel herikî qadan. Ciwanan bi kevir û molotofan bersiv dan êrîşên polîsan û kuçeyên Geverê wergeriyan qada şer.

Li navçeya Geverê ya Colemêrgê bazirganan bi mebesta şermezerkirina girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kepengan girtibû û bi sedan ciwan li navenda sûkê civiyan. Ciwanan agir vêsitin û diruşimên derbarê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de berz kirin. Girse dest bi meşê kir û polîs jî bi gazên îsotê êrîşê gel kir. Ciwanan, bi kevir o molotofan bersiv dan êrîşa polîsan. Çalakî li her kuçeyên navçeyê belav bû. Di encama pevçûnên ku heta êvarê dom kirin de hate ragihandin herî kêm 6 kes birîndar bûn. Polîsan li hemberî girseyan bombeyên gazê bi kar anîn. Gever vegeriya qada şer.Li navçeyê, dikandaran kepengên xwe venekirin û girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar kirin.

***EDENE:*** Li Edeneyê jî ciwanan mebesta şermezerkirina girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan erebeyeke korgoyê bi benzînê hate şewitandin. Bûyer di saet 23:15’ê şevê de pêk hat. Kamyona şîrketeke korgoyê bi benzînê hate şewitandin. Di encamê de erebeyê, xesareke mezin dît û ket rewşa ku nayê bi kar anîn.

## Li Mêrsînê çalakî

Li taxên Şevket Sumer, Yenipazar, Gunei û Gundogdu yên navçeya Akdenîzê ya Mêrsînê bi munasebeta şermezarkirina girankirina tecrîta li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û birîndarkirina zorokek a ji aliyê polîsan ve şermezar bikin kepengan venekirin. Duh heta êvarê tu bazirgan kepengên xwe venekirin û bi sedan polîs çûn navçeyê. Li navçeyê rewşa germ didome û her wiha hat hînbûyîn ku rewşa tendurustiyê ya Ş. A. ku ji aliyê polîsan ve hatibû birîndarkirin, ber bi başiyê ve diçe.

Însiyatîfa Gel a Demokratîk a Mêrsînê jî derbarê mijarê daxuyaniyek da. Însiyatîfê diyar kir ku dewlet dixwaze gelê kurd di şexsê Ocalan de terkî mirinê bike. Însiyatîfê dest nîşan kir ku divê hemû bertekên rewa bêne nîşandan. Însiyatîfê di daxuyaniyê de wiha lê zêde kir: “Divê ku gelê kurd li dijî vê yekê berxwedaneke bêhempa nîşanê dijminên xwe bide. Ev berxwedan peywireke dîrokî ye. Ev peywir di serî de ciwan, li ser milê hemû kurdên bi rûmet û yên girêdayî Rêber Apo ne, ye. ” **MÊRSÎN**



Ahmet Aktaş
saktas25@hotmail.com

## Mexmûr ji xwe re kirin hedef

Xuya dibe ku, Dewleta Tirkiyeyê, wargeha Mexmûrê di plana xwe de niha weke yek ji mijara yekemîn kiriye armanc.

Bêguman armanca wan ya yekemîn û sereke Îmralî ye, Rêber APO ye, duwemîn gerîla ye, lê aşkera ye ku li vî alî diranê wan pê de naçe, lewma berê xwe dane wargeha Mexmûrê.

Diyar e vira ji xwe re weke xwarineke nerm dibînin û wisa hesab dikin ku dê diranê wan tê de biçe, lê ez bawer dikim diranê wan di vir de jî dişikê.

Hesab û kitabê wan hemî li ser ku, eger ligel hikûmeta Bexdayê û hikûmeta Herêma Kurdistanê pêk werin, plana wan dikare bimeşe!

Ji bo ev plan û projeya wan bimeşe gelek hewldan; Receb bi xwe carekê, Ahmed Davudoglu gelek caran hatinçûyîna Bexdayê û başûrê Kurdistanê kir û bi hev re gelek tişt axivîn.

Helbet em axaftinên wan yên paşperdê, yên bi dizî, yên veşartî bi berfirehî nizanin, belê yên ew bi xwe jî aşkere dibêjin ev e ku; pir zelal li ser dijminatî û şikandina Tevgêra Azadiya Gelê Kurdistanê kûr û dûr axivîne.

Vêca ka bi hev re çi plan çêkirine, dê çi dek û dolaban bigerînin, heta çi astê dê bi hev re xerabiya tevegera kurdan bikin, di vî warî de gihiştine çi biryaran gelek ne zelal e.

***

Helwesta Rêber APO zelal e, her wiha helwesta gel û gerîlayên Kurdistanê aşkera û delal e; li hemberî êrîşên dewletê serê xwe natewînin, bi lîsk û xapînokên AKP’ê jî hesiyane, derewa “açılım”ê jî rût û tazî derket holê.

Siyaset û projeyên kiryarî yên dewleta Tirkiyeyê ne ji derveyî siyaset û agahdariya DYA’yê ye, dewletên YE’yê jî hinek bi deng û hinek jî bi bêdengiya xwe piştgiriyê dike.

Êdî hema hema helwest û siyaseta her alî aşkera bûye, bi tenê ya hêzên Başûr ne zelal û sergirtî maye û ev helwest jî gelek giring e, ji ber ku eger dewleta Tirkiyeyê piştgiriyê ji vira negire hêviya wan a serkeftina di êrîşên xerabkariyê de namîne.

Lewma divê di vê qonaxa nazik û hesas da her hêz û bi taybetî hêzên kurdistanî siyaset û helwesta xwe gelek zelal aşkera bikin, cihê şik û gumanê tê de nehêlin.

Jixwe diviya ji kevn de jî, têkiliyên bi hemû dewletan ra û taybetî ligel van dewletên dagirker, li paş perdê ji bo pirsgirêkên neteweyî û bi taybetî li ser hesabê hêzên Kurdistanî tiştekî veşartî nebûba û nehatiba qebûlkirin.

Rêberekî kurdan ew ê li zîndana Îmralî di asta mirinê de di bin şert û mercên îşkencê de be, li Îranê ciwanên kurdan dê bên bidarvekirin, li Sûriyeyê li zîndana Edrayê li dijî zilma dewletê zindaniyên kurdan di çalakiya nexwarinê de be, polîtîka dostanî û dîplomasî û helwestên dizî yên paşperdê li ser doz û hêzên kurdan bi van dewletan re nabe, nabe, nabe.

A herî rast û baştir ev e; partî û rêxistin û kesayetiyên kurdan bi lez û bez di Konferanseke Neteweyî de li hev kom bibin û her hêz û kes siyaset û dîtinên xwe aşkera û zelal ji raya giştî kurdan û raya giştî cîhanê re bêjin.

Wê demê şik û guman li ser tu kesî û li ser tu hêzê namîne, her kes û her hêz rihet dibe, ya herî baştir jî gelê kurd rihet dibe!

Helwesta gelê me yê Mexmûrê heta niha çi bû, ez bawer dikim ji niha û pê ve jî dê her bi wî awayî hêja be û dê siyaseta dewletan û kevneperestan pûç derxin.

www.arsivakurdi.org

## Polîsekî afgan 6 polîs kuştin

Li herêma Kaş Rod a eyaleta Nîmroz a Afganistanê polîsek bi çeka xwe gule li noqteya kontrolê ya polîsan reşand. Di encamê de 6 polîs kuştin û 2 polîs jî birîndar kir. Piştî bûyerê polîs bê ku bê girtin revî û xwe rizgar kir. *QABÎL*

## Korsanan keştiya Yewnanîstanê revand

Berdevkê Hêzên Leşkerî yê YE'yê John Harbour got ku korsanên Somaliyê keştiyeke Yewnanistanê ya bi navê Maran Centaurus ku ji Erebîstana Siûdî neft dibir Amerîkayê desteser kir û revand. *NAÎROBÎ*




# Li Uruguayê Serokdewletê gerîla

**Li Amerîkaya Latîn keleheke din a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ket. Di hilbijartina Uruguayê de pêşeng û lîderê berê yê gerîlayên Tupamaros Jose Mujica pişgiriyek mezin a gel bi dest xist û bû serokdewlet**

Li Amerîka Latîn her ku hilbijartin çêdibe desthilatiyên muhafazar û rastgir têk diçin û çepgir û sosyalîst bi ser dikevin. Ev jî li herêmê herî zêde Amerîkayê dixe tengasiyê. Di hilbijartina serokomariyê ya Uruguayê de jî berendamê çepgir û rêberê berê yê gerîla Jose Mujica hate hilbijartin.

Li gorî encamên sindoqên hilbijartinê Mujica, nêzî ji sedî 50'ê dengan bi dest xistiye û reqîbê xwe yê serokomarê kevin Luis A. Lacalle têk bir. Lacalle ancax ji sedî 45'ê dengan bi dest xist.

**Mujica sosyalîst e**

Muxalifên Jose Mujica dibêjin ku serokatiya gerîlayê berê dê Uruguay ber bi sosyalîstiya radîkal ve bibe.

Mijica dê di 1'ê adara 2010'an de dest bi pêwîra xwe bike. Bi vê yekê dê di kongreyê de koalîsyona eniya berfireh 5 salên din jî dewam bike.

**Dijberê Amerîkayê ye**

Mujica, di salên 1960'î de ji şoreşa Kubayê sûd girt û di nava komên çepgir ên Amerîkaya Latîn de cih girtiye. Li kêleka Tupamaros ew jî yek ji endamên damezrîner bû.

Tupamaros Uruguay ne mîna bajarên din ên Amerîkaya Latîn li dijî Amerîkayê hatibû birêxistinkirin.

**15 sal girtî jî maye**

Di 1971'ê de Mujica, 15 salan di zindanê de girtî maye û rastî îşkenceyê hatiye û di zindana takekesî de maye.

Tevgera Tupomoros ku navê xwe ji rêberê herêmî Tupoc Amaru girtiye, Amaru bi têkoşîna li dijî çete û zordestan bûye wek pênas.

Ji şêlandina bankayan heta bi desteserkirina kamyonên xwarinê û belavkirina wan li xelkên xizan cih girtiye bi van çalakiyan di nava gel de tê hezkirin. Ligel hemû zext û zoran demeke dirêj nehat girtin.

**Lîderê bizava gerîla bû**

Li dijî emperyalîzmê têkoşîna serxwebûnê hat dayîn. Di wê demê de têkoşîn gelek geş û gur bû. Serokê têkoşîna şorexger Raûl Sendîc û Mujika bû. Sendîc di salên 1990'an de jiyana xwe ji dest da û Mujika heta serokdewletiyê tîrendeke rengîn a têkoşînê meşand.

Serokê tevgera Tupomoros di sala 1970'î de ji alî cûntaya leşkerî ve hate girtin û di sala 1987'an de serbest hate berdan û ji aliyê bi hezaran kesî ve hate pêşwazîkirin. Di hilbijartinên destpêkê de bû serokê şaredariya Montevîdeo û piştre ku di dîroka Urguay de cara yekemîne ku mirovekî çepgir li ser kursiyê serokatiya dewletê bi dest dixe. **MONTEVÎDEO**

## Li Îranê 10 tesîsên nû yên nukleerê

Îranê aşkera kir ku dê 10 tesîsên nû yên dewlemendkirina nukleerê ava bike.

Li gorî ajansa fermî ya Îranê heta niha cihê 5 tesîsan hatiye diyarkirin û ji bo 5 tesîsên din jî hêj cih nehatine diyarkirin. Serokê Daîreya Nukleerê ya Îranê Elî Ekber Salihî destnîşan kir ku dê ev tesîsên nû li dijî êrîşan, dê di nav çiyayan de bên avakirin.

Welatên Rojavayî yên ku ev demeke dirêj e li ser Îranê zextan dikin bertek li dijî vê biryara nû ya Îranê nîşan dan.

Amerîkayê da zanîn ku Îran bi van biryaran berpirsyariyên xwe yên navneteweyî bi cih nayne û dîsa bi van biryaran xwe di nav civaka navneteweyî de dike rojeva sereke. Îngilistanê jî derbirî ku ew ji ber vê biryara nû ya Îranê bi fikar e. Almanyayê jî bang li Îranê kir ku bila sozên xwe yên dane raya giştî ya navneteweyî bi cih bîne.

Konseya Ewlehiyê ya Netewên Yekbûyî jî biryar girt ku li ser Îranê ambargoyê bi kar bîne.

Roja yekşemê Parlamentoya Îranê jî bang li Serokomariyê kir ku hevkariya xwe ya bi Saziya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî re kêmtir bike.

Serokê Parlamentoya Îranê Elî Laricanî jî derbirî ku heke zextên raya giştî ya navneteweyî bidome dê hevkariya wan û Saziya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî qut bibe.

Di rapora hefteya borî ya Saziya Enerjiya Atomê ya Navneteweyî de jî hatibû diyarkirin ku Îran li dijî biryarên Konseya Ewlehiyê ya Netewên Yekbûyî xebatên xwe yên dewlendkirina ûranyûmê bênavber domandiye. **TEHRAN**

## Medvedev: Bila zor qedexe be

Hat aşkerakirin ku Serokdewletê Rûsyayê Dîmîtrî Medvedev ji bo peymaneke nû ya ewlehiyê ku dê bi Ewropayê re bê kirin, nivîsek şandiye ji Serokdewletên Ewropayî re. Li gorî rêziknameya ku di malpera fermî ya Kremlinê de hat weşandin, tu alî nikarin li dijî hev şîdetê bi kar bînin û gefan li hev bixwin. Pêşniyara pakta nû ji aliyê Medvedev ve hatibû kirin. Di nav Rûsya û Fransayê de her diçe têkilî xurt dibin û 3 roj berê bi qasî 13 peyman di nav van her du aliyan de hatin mohrkirin. **MOSKOW**

## Bi hilbijartinê dîktator tên rewakirin

Li Hondurasê nilbijartin piştî 5 mehan ku bi derbeya leşkerî li dij Manuel Zelaya pêk hat û ew ji serokdewletiyê hat avêtin pêk hatin. Namzetê muxalefeta muhafazakar Pirfirio Lobo ji sedî 55 dengan girt. Lê alîkarê Zelaya ku ji bo beşdarî hilbijartinan bibe peywira xwe berda û di hilbijartinan de bi ser neket. Rayedarên hilbijartinê destnîşan kirin ku hilbijartin bi tevlibûneke xurt û normal derbas bûye û ew jî ji ber vê bextewar in.

Roberto Michelettî ku hem Zelaya û hem jî cûntaya leşkerî ya ku rêveberiya Zelaya qeliband, piştgirî didanê beşdarî hilbijartinan nebû.

Amerûka hilbijartinan erênî dinirxîne, lê Brezîlya, Arjantîn û welatên din ên Amerîkaya Latîn hilbijartinê qebûl nakin û wek hilbijartina rewakirina derbekaran destnîşan dikin. Hat gotin ku ew ên hatine hilbijrtin jî wek rûyê din ê darbekaran qebûl dikin. **CARACAS**


Manuel Zelaya

## THEE li Atînayê ji bo Qerebaxê civiya

Îro li Atînayê civîna Wezîrên Karên Derve ya Teşkîlata Hevkariya Ewlehiya Ewropayê (THEE) pêk tê. Di civîna bilind a wezîran de mijara Qerebaxê tê nîqaşkirin. Heke di civînê de encameke baş bê bidestxistin dê ev ji bo pêşketina hewldanên Tirkiye-Ermenistanê dê bibe hewldaneke baş.

Di civînê de wezîrê 56 welatên endamên THEE'yê cih bigirin. Civîn di pêşengiya Wezîrê Karên Derve yê Yewnanistanê de dest pê dike. Ev civîn wek hêz biryar girtina TÎEE'yê ye û biryarên ku berê hatine girtin jî dê civînê di ber çavan re derbas bike. Ancax civîn pirtir dê wek civîna bilind a Qerebaxê derbas bibe.

**Civîna 3+2 ya krîtîk**

Koma Minsk ev demeke dirêj e ku li ser pirsgirêka Qerebaxê dixebite. Di vê civînê de jî ev xebat wek kar û bareke stratejîk dê esas bê girtin. Di vê çarçoveyê de ji bilî civîna THEE'yê dê civînên tengtir jî bên lidarxistin. Bi taybetî Hevserokên Koma Mînskê Amerîka, Rûsya û Fransa û Azerbaycan-Ermenistan wek civîneke 3+2 çêbikin. Ev civîn wek civîneke pir krîtîk tê dîtin.

**Dê Tirkiyeyê rehet bike**

Heke li Atînayê di van civînan de pêşketinek pêk bê dê bandora xwe li ser têkiliyên Tirkiye û Ermenistanê jî bike.

Rewşeke wisa Tirkiye û Ermenistan dê hêsantir her du protokolên ku mor kirine bixin meriyetê. Piştî ku Tirkiye û Ermenistanê di meha cotmehê de li Zûrîhê her du protokol mohr kirin di nav Tirkiye û Azerbaycanê de jî alozî rûda. Ev alozî her diçe kûrtir dibe.

Di vê civînê de Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Ahmed Davutoglu cih digire û dê bi gelek welatan re hevdîtinên dualî jî bide meşandin. Lê nehat gotin ku di van hevdîtinan de li ser kîjan babetan rawestin. **ATÎNA**




### 'Tirkiye mecbûr e deriyê xwe ji keştî û balafirên Kibrisê re veke'

***CÎGIRÊ*** Wezîrê Karên Derve yê Yewnanistanê Dîmîtrîs Drutsas bi daxuyaniyekê bal kişand ser helwesta Tirkiyeyê ya li dijî Yewnanistanê. Hat gotin ku Tirkiye wek welatekî berendamê YE'yê berpirsiyên wê hene û divê li gor wan tevbigere. Di nav van berpirsiyariyan de têkiliyên baş ên cîrantiyê hene û wiha pê de çû: "Ev berpirsiyarî naveroka protokola Enqereyê ye jî. Li gor serencama vê protokolê yekîtiya Gumrikê di nav YE û Tirkiyeyê de ket meriyetê. Komara Kibrisê jî di nav vê de ye."

Cîgir Drutsas da zanîn ku Tirkiye ligel van biryaran jî berpirsiyariya xwe bi cih nayne. Bender û balafirên Tirkiyeyê hê jî ji bo keştî û balafirên Komara Kibrisê nehatine vekirin. Li gor peyman û protokolên ku hatine mohrkirin Tirkiye mecbûr e ku bender û balafirgehên xwe ji balafir û keştiyên rûman re vekin.

Dîmîtrîs Drutsas beriya civîna bilind a YE'yê ku ji bo Protokola Pêvok dê bicive daxuyanî da rojnameya Frankfurter Allgemeine Zeitungê ya Almanyayê. Drutas vegot ku ew piştgiriyê didin ku Tirkiye bibe endamê YE'yê. Ancax welatekî berendam ê YE'yê jî berpirsiyên xwe hene. Tirkiye ku van berpirsiyên xwe ji nedîtî bê û pêk neyne nabe.

Drutsas wisa dirêjî da axaftina xwe: "Tirkiye hemû peymanên mor kirine binpê dike û bender û balfirgehên xwe ji bo keştî û balafirgehên me venake. Pirsgirêka Egeyê heye, pirsgirêka qada hewayî ya Egeyê heye hê ji bo vana çareseriyek nehatiye dîtin."

Drutsas ji bo qada hewayî jî bal kişand ser mijara hiqûqî û wiha vegot: "Mijarên wisa divê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve di dadgeha Navneteweyî ya Lahey de bê dîtin û bi biryareke hiqûqî bê çareserkirin. FRANKFURT

## Barosso ji bo hawirdorê hişyarî kir

Serokê Komîsyona Ewropayê Jose Manuel Barosso, bang li Çîn û welatên din kir ku der barê guherîna avhewayê de gavên mezintir biavêjin. Barosso roja yekşemê li bajarê Nanjing a Çînê axivî. Barosso destnîşan kir ku sozên heta niha hatine dayîn ji bo biryarên xurt ji sercivîna Kopenhagê derkeve ne bes in. Manuel Barosso anî ziman ku sozên ku dewletan ji bo kêmkirina emisyonê dabûn gelek kêm in û li gorî zanyaran di asta herî jêr de ne.

Barosso ji bo sercivîna Çîn û Yekîtiya Ewropayê (YE) çû Çînê û li wir bi Serokdewletê Çînê Wan Jiaboya re hevdîtinek pêk anî. Çîn her ku sanayiya xwe pêş dixe pirsgirêka wê ya bi hawirdorê re jî zêde dibe. **BRUKSEL**

www.arsivakurd.org

# Utamara ji konferansê re malovanî kir

Navenda Gihîştinan Jinan UTAMARA malovanî ji konferansa projeya 'Dorpêça şîdetê bişikînin' kir. Konferansa 'Dorpêça şîdetê bişikênin' ji aliyê bernameya DAPHNE'yê piştgirî dibîne.

Konferansa ji bo projeya afirandina meteryalên alternatîf di navbera 25-29'ê mijdarê de konferansa Navenda Hevdîtina Jinan a UTAMARA pêk hat.

Proje di bin banê YE'yê û bi sernavê 'Dorpêça şîdetê bişikînin' hate meşandin. Her wiha piştgiriya herî mezin jî ji aliyê DAPHNE'yê ve tê dayîn. Armanca vê projeyê ev e ku li dijî her her cureyê şîdet û newekheviya li hemberî zarok, ciwan û jinan pêk tê têbikoşin. Ji Bulgarîstan, Slovakya û Londonê sazî tevli konferansê bûn. Ligel van saziyan UTAMARA jî wekî yekane saziya jinan wekî nûnertiya Almanyayê tevli konferansê dibe. Di çarçoveya projeyê de li civakên penaber yên ku koçî welatên Yekitiya Ewropayê kirine xebat tên meşandin.

Bi vê projeyê tê armanckirin ku ji bo perwerdehiya jin û zarokan alternatîf bên afirandin. Her wiha ya herî girîng jî ev e bo perwerdekirina jin û zarokan têkoşin.

UTAMARA pêşnûme amade kir. UTAMARA jî di vê mijarê de xebatên xwe meşandin û hin encam derxistin holê. Li gorî van encaman pêşnûmeyek amade kirin û ev pêşnûme di konferansê de pêşkêş kirin. Di pêşnûmeyê de, hiyerarşî, newekheviya perwerdehiyê, pergala perwerdehiyê, modelên rola zayendiya civakî, feraseta zihniyeta serdest a mêr, şîdeta li hemberî jin û zarokan, afirandina çanda ekolojîk û demokratîk esas tê girtin. Ev pêşnûme ji aliyê saziyên dewletên din ve erênî hat dîtin.

Di çarçoveya bernameya 4 rojan de konferansa ku bi sernavê 'Jinên penaber û ji bo parastina jinên penaber hewcedariya makeqanûnan' li Muzeya Neuwîed pêk hat. Komîsyona avakirina şertên wekheviyê ji aliyê endama konferansê Dorîs Eyl- Muller û Utamara ve hate amadekirin.

Navenda Gihîştina Jinan UTAMARA di çarçoveya projeya afirandina meteryalên alternatîf de ji konferansa navneteweyî re malovanî kir. Di çarçoveya bernameyê de gelek semîner pêk hatin û her wiha girîngiya cihê jinên kurd jî hate nîqaşkirin

Ji 70'yî zêdetir parêzer, pedegog, sosyolog û aktîvîstên mafê jinan tevlî konferansê bûn. Li ser dozên mînak nîqaşên kûr pêk hatin. BERLÎN

## Cihê jina kurd hate vegotin

**LI ALIYÊ** din di çarçoveya bernameya konferansê de, semînereke bi ser navê 'Di civaka kurd de cihê jinê' pêk hat. Semîner ji aliyê rojnameger û parêzvana mafê jinan Havîn Guneşer ve hate pêşkêşkirin. Di semînerê de mijarên bi ser navên 'Di warê jeopolîtîk de Kurdistan', 'Zextên li ser civaka kurd û jinên kurd' hatin nîqaşkirin. Nîqaşên li ser jina kurd, têkoşîn û lêgerîna azadiya kurd bi eleqeyeke germ hate gundarîkirin û nîqaşên ku hatin kirin jî gelek erênî bûn. Her wiha di beşeke konferansê de xwarinên kurdan jî hatin pêşkêşkirin û hunermanda kurd Sakina muzîka xwe pêşkêş kir. Ligel vê Utamara ku demeke berê der barê mêran de semînerek pêk anîbû jî di nava mijarê de cihê xwe girt. Mêrekî ku tevli semînerê bibû li ser girîngiya van xebatên wisa sekinî û diyar kir ku xebatên wisa encamên baş derdixîne holê û got ku li wî bandor kiriye.
Ev gotinên vî kesî di salonê de eleqeyeke mezin dît. Her wiha jinên ku ji saziyên dewletên din tevli konferansê bibûn jî diyar kirin ku divê perwerdehiyên wisa demildest bêne organîzekirin.

## Îdiaya li Cizîrê jinekê 'întihar' kir


Hate îdiakirin ku jina bi navê Mevlîde Garan (22) li navçeya Cizîrê ya Şirnexê xwe ji latê avêtiye xwar û întihar kiriye.

Hate îdiakirin ku jina bi navê Mevlîde Garan a 22 salî ya ku li navçeya Cizîrê xwe ji latên Caferî Sadik ên li taxa Cûdiyê avêt û întihar kir.

Cenazeyê Mevlîde Garan, ji bo otopsiyê rakirine Nexweşxaneya Dewletê ya Cizîrê.

Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin Mevlîde Garan endama meclîsa Taxa Cûdiyê ya DTP'ê bû. ŞIRNEX (DÎHA)

## Keça kurd namzeta şahciwaniyê ye



Demekê temenê Cêsîka Lagas 'Jessica Lagas' 11 mehî bû. Ev keça kurd bê dê û bê bav bû. Ligel vê Cêsîka li Iraqê ji ber birçîbûnê bi mirinê re rû bi rû mabû. Pora Cêsîka diweşiya û nedikarî li ser piyan bisekine. Laşê wê lawaz bû.

Niha temenê Cêsîka 18 salî ye ji bo pêşbirka şahciwaniya nûnertiya Kalîforniyaya Amerîkayê dike. Cêsîka û xwîşka xwe ya 20 salî ku navê wê Şîrîn e, ji başûrê Kurdistanê ne. Navê diya wan Kurdistan bûye û di sala 1991'ê de di encama êrîşa bombeyî de hatiye kuştin. Lagas der barê jiyana xwe de wiha dibêje: "Dema ku dayika min jiyana xwe ji dest dide, bavê min derî bi derî digere. Ji bo ku dayik çend rojan lê binêrin. Bavê min li kampa penaberan li Tirkiyeyê danûstandin dikir. Dema ku bavê min diçû em tenê diman. Kes li me xwedî dernediket. Me xwarinek baş nedixwar." Di mijdara 2006'an de, Dîan Lagas di axaftineke xwe de der barê çîroka van keçan de wiha digot: "Tişta ku me dît krîza xwarinê bû. Tugav min kes nedîtiye bi vî awayî bê çewsandin." Li ser daxwaza Serdar, wan jin û mêrên Amerîkî ew du keç bi xwe qebûl kirin û bi riya qanûnî kirin keçên xwe. Cêsîka dibêje ku bavê wê qet nayê bîra wê. Dibêje ku tenê wêneyekî bavê min di destê min de ye. Dayika xwe jî qet nedîtiye. Niha Cêsîka tevli pêşbirka şahciwaniya 2009'an a Kalîforniyayê dibe. Cêsîka got ku daxwaza wê ya herî mezin ev e pêşbirkê qezenc bike. *Rûdaw*

## Bîranîn



Husniye Orûç
Binevş Amed
1974 Çinar
01.12.1998 Lice

*roj û gerî tu*
*kulîlk û reng î tu*
*kevok û deng î tu*
*bang û mirad î tu*
*qublegeha dîlan î tu*
*şehlewendê pîr î tu*
*baqê sosin û gulan î tu*
*di destên dot û xortan î tu*

**Li ser navê malbata wê ji girtîgeha Erziromê apê wê Alî Ekber Oruç**

## Li Afganîstanê şîdet zêde dibe

NY'ê bi raporekê diyar kir ku şîdeta li hemberî jinê li Afganîstanê zêde bûye û her diçe kûrtir dibe. Her wiha NY'ê da zanîn ku 8 sal piştî hilweşîna rejîma Talîban hebûna jinê di civakê de tune hesibandin.

NY'ê bi munasebeta 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Navneteweyî ya li Dijî Jinê kampanyayek dest pê kiribûn. Ev kampanya dê heta 10'ê kanûnê bidome. Kampanya 16 rojan didome. Di çarçoveyê de berpirsê mîsyona mafê mirovan a NY'yê Norah Nîland li Navenda Navneteweyî ya Mafê Mirovan bi berpirsên Afganîstanê Ziya Mobalegh re civîneke çapemeniyê pêk anî. Nîland diyar kir ku di civaka Afgan de şîdeta li dijî jinan her diçe zêde dibe. Saziyên dewletê jî jinan mehkûm dikin û tênakoşin. QABÎL



REYHAN SARHAN

## Nameyek ji bajarê dilê min

Niha dema ku ez dest bi vê nameyê dikim û çi gotina xweş û nazdar heye dixwazim ji bo te bixim rez û bihonim, mîna porên jineke kurd a hinekirî ya ku bîhna sabûna kizwanê jê difure çil û hezar kezî bihonim.. bi wan re jî ji bo te peyv û hevokên herî maqûl û bi rûmet bixim rêz û li ser lênûska xwe bar bikim… Lê belê ew qas jan û êşên ku tu û zarokên te dikişînin û ew gemariya ku li ser we hatiye ferzkirin rê nade ku ez ji bo we hunera xwe ya bi peyv û rêzên hevokên helbestî û wêjeyî raxînim û bi we re parve bikim… Dizanim ev ne sûcê te ye û ev yek hema ji bal xwedê pêk nehat ev bi keda serdest û zordaran pêk hat û bi zanebûn û projeyên mezin hate amadekirin heta ku tu xistî vî halî û jiyan li ser te û gelê te tar û mar kirin…

Dizanim, tê ji min gazindan bikî û tê bibêjî tu çima ew qas xemsar diaxivî û bêhêvî dinivîsî. Rast e, lê ez niha li ser te û di hundirê te de ez wiha his dikim û vê rastiyê yan jî vê derewê dibînim… Çi dikim ji bo ku ez xwe bidim alî ji vê xemsariyê lê nabe…

Çiqas dixwazim nas bikim ewqas jî têk diçim û bêhêvî dibim ji te na na, ne ji te ji jiyana ku li ser te tê ferzkirin û dixwazin ku bidin meşandin têk diçim …

Ma tu zanî tenê tiştek heye ku hêvî dide min û min hindik be jî şa dike ew jî lîstokên zarokên te yên 4/5 salî yên ku bi ziman û çanda te dest bi axaftina zimanê xwe yê zikmakî dikin di kolan û kuçeyên te yên bi toz û deştî de….

Yên ku bi nanê tendûr û xwarinên kurdî mezin dibin.

Ma tu zanî hestên min jî mîna min ji jiyana li ser te direvin?

Çiqas dixwazim wan şûnde wergerînim û em li ser te jiyanek xweş ava bikin!

Ew hinek dûr û zehmet dibe û dil û mejî li hev nakin.

Dibe mejî li vir be, lê dil qet û qet naxwaze xwe nêzî van deran bike û heta ku ji tê ew dûr û kûr direve xwe li beravên biyaniyê dipêçe…

Ma çawa dil dikare bêmejî bijî?

Ne mejî bê dil heye ne jî dil bê mejî her du bi hev re hene û dikarin bi hev re hêzekê biafirînin

Ji bo vê ez li ser te êşê dikişînim ku nikarim ji janên te re bibim bersiv û derman.

Ji bo ku te bi hestên tenik bi helbesta xwe bixim rêz û vejînim.

Dizanim ez deyndarê te me.

Ji bo ku te bi qirêjiyan re rû bi rû dihêlim û winda dibim

Ez vê nameyê ji bo ku hinek barê deynê xwe sivik bikim û hewarên xwe hinek sist bikim nameyeke bi vî awayî dinivîsim.

Dema ku hemû şênî û bajariyên te radikevin li ser ban û textên xwe yên şîn ku dora wan ji perdeyên reng bi reng dorpêçayî de di xewna şîrîn de ez dixwazim vê êşa dilê xwe bi nameyekê hestên xwe ji te bînim ziman û lêborîna xwe ji te bixwazim…

Lê ez ji bo ku nameyên tijî hêvî û jiyan ji te re binivîsim ez li wan roj û çaxan bigerim

Ma jixwe ji bo vê min xwest di biharê de bêm li ser te bijîm û vî dilê xwe yê ku li min guhdar nake qayîl bikim… Lê na wa dîsa nebû û min zora dil nebir… dil zora min bir…Jixwe ez tim bûm girtiyê dil û wî got çi min da dûv û nivê jiyana xwe min wisa derbas kir û wilo dixuyê ku ez heta dawiya xwe jî bidim dû dilê xwe yê ku ez bê war û cih kirime…Niha ez ji te xatirê xwe dixwazim û lêborîna xwe dubare bikim...

Dizanim ez ji bo te nebûm keçek bi biryar û min ji bo te tu tişt nekir û ji birînê te re nebûm derman û melhem û hekîm… Careke din li min biborîne bajarê min yê windahî û xwekuştinan.

Lê tu vê jî baş bizanibe ku serhildanên te jî bi qasî windahî û xwekuştinên te bi nav û deng in û bê mînak in…

www.arsivakurdi.org

# Derba verêne Koçgîrî

LERZAN JANDIL

Koçgîrî demê rijîyayişê Osmanîyan ra derbazê Cumhurîyetî bîyene de sarewedardayena Kurdan ya verên a.

Koçgîrî binê serekatîya roşnavîranê Kurdan Alîşêr, Heyder, Alîşan û Nurî Dêrsimî de sarewedardayena Kurdanê Qizilbaşan a.

Koçgîrî cengê, angorê peymanê Sevrî wîlayetanê Amed, Elezîz, Wan û Bidlîs de Kurdistanêde azad ava kerdene, wo.

Koçgîrî tawo ke Hukumatê Ankara huna umete bîyene ra nêvejîya bî, bi ruhê Îslamî, girêdayeyê Xelîfeyî yewtîya şaranê Musluman waştêne, cengêde azadîya şarê Kurdan o.

Koçgîrî derba verên a. Koçgîrî qetlîam o.

Mîmarê nê qetlîamî Sakalli Nurettîn Paşa (Nuretîno herdîşin), zama û yaverê Nurettîn Paşayî Abdulah Paşa, Topal Osman (Osmano leng) û M. Kemal ê. Sakalli Nurettîn Paşa komandantê "Merkez Ordusu" wayirê nameyêde qilêrinî, sîcîlêde xirabin o.

Topal Osman hem merdimê Teşkîlat-i Mahsusa wo, hem kî merdimê M. Kemalî yêde xas o. M. Kemal 29ê Gulane 1919´da Havza de T. Osmanî vîneno û ci ra vano: "Ti çeta xo bivurnê, yew alayîye bike ava. …" Rêyêna M. Kemal T. Osmanî ra "Belayê Pontusî temîzkerdene taybetîye destanê to yê bi tecrubeyan re ca verdana." vano.

Abdulah Paşa, zama û yaverê Nurettînî Paşayî qesabê Dêrsimî yo.

M. Kemal hem verpersîyar û hem kî şirigê qetlîamê Koçgîrî yo. Derheqê qetlîamê Koçgîrî de Walîyê Erzinganî Ebubekîr Hamza vano: "Pêro pîya 132 dewî sey istîhkamê dişmenan amê rijnayene, xirab kerdene, bi sedan kesî amê kîştene. Bê naye mal, eşya, zexîre û dawar pêro pîya amo talan kerdene." Walî Hamza vano: Nurettînî "Ceng (musademe) nêkerdo, qetlîam kerdo."

Nê kerdenê corênî kî kena eşkera ke, demê Osmanîyan de canê Qizilbaşan (yanê kîştena înan) helal, lê malê Qizilbaşan helal nêbî. Demê Koçgîrîye ra nat, yanê demê Cumhurîyetî de hem kîştena Qizilbaşan hem kî malê Qizilbaşan bî helal.

Koçgîrî û Koçgîrî ra nat malê Kurdan, taybetîye kî malê Kurdanê Qizilbaşan talan kerdene, tirtene; bi kilmîye duştê înan de çapulcîyênî kerdene, bîye karekterê cengê Tirkîye. Rêyêna derheq qetlîamê Koçgîrî de Wekîlê Erzinganî Emîn Beg nîya vano: "…. Domanê hîrê sereyî tahamulê nayê nêkenê. Eke ma rastê çîyê nîyanênî bibîme, rica kena, kam gula nêrzono. Bi na qeyde panc mîlîyonî, desûheşt mîlîyonî serwet maf bîyo. … Ez amede ya, îspat bikerî. Osman Paşayî (Topal Osman) hîrîs hezar heywan berdo."

Wekîlê Erzinganî Emîn Beg çîyêde tewr balkêş vano, ke no çî karekterê cengê Koçgîrîye û îmha kerdena ey zelal nîşan dano. Emîn Beg vano: "Çim verdo serwetê yew Tirkî û cênîyan mêrikî bi zor dest ra ama girewtene, vato seba ke ti Alewî (Qizilbaş) a, malê mêrikî talan kerdo û pêyco kî kîşto."

Vatişanê Emîn Begî ra êno famkerdene, ke Koçgîrî hem qetlîamê Kurdanê Qizilbaşan o, hem kî Tirkanê Alewîyan (Qizilbaşan) o. Yanê qetlîamê yew grupe, yew dînî, kesanê yew dînî yo. Ha Kurd ha Tirk kîştena, qetlîamê Qizilbaşan/Alewîyan o.

Ma gelo no kî teqabulê yew jenosîdî nêkeno?

Rêyêna: Kochgîrî derba verên a. Eke derba verêne mêro famkerdene, derba pêyêne (Dêrsim) kî nêna famkerdene.

# Çima zimanê dayikê?

Amadekar: SERDAR BALCI

***"Ji zimanan re erê, lê bi tenê ji zimanê mêtinkaran re na!"***

Li Misra berê, girîngiya mejî dihate zanîn. Dema ku lîderek bimira, di firnikên pozê wî re mêjiyê wî dihate derxistin. Heta vê yekê jî têr nedikir, mêjî dihatin veşartin û piştre jî ev yek bûbû kevneşopî.

Bûyerên di beriya temenê 4 saliyê de nayên bîra mirovan. Ji ber ku "hîpokampus" (cihê tomargeha bireweriyên demdirêj) a beşa "pergala lîmbîk" ku di kûrahiya mêjiyê de ye hê negihiştiye. Ev yek nayê vê wateyê ku tomargehek ji bo beriya temenê 4 saliyê tuneye. Baş e, di beriya 4 saliyê de çi dibe? Mêjiyê bîrdar hay ji wê tomarkirinê nebe jî, tomarkirina "amîgdala"yê digihîje heta zikê dayikê. Çêja xwarina çandî, tirsa ji tiştekî ya dayika ducanî, axaftina dêbavan (ev pir balkêş e), nasîna kesên ji malbatê û hwd...

Di xwezayê de tu tişt winda nabe. Li gorî ola Îslamê, roja heşrê dê her kes ji bo kirinên xwe hesabê bide. Gelo di dema daketina Pirtûka Pîroz de kê hay ji hiyerarşiya nava mêjiyê hebû? Peyama di nava "tevgerên nebaş dê bêbersiv nemînin, her kes dê hesabê başî û nebaşiyên xwe bide." çawa gihîşte bi mîlyaran mirovan. Roja hesabdanê, hîpokampus û amîgdala... Heke wisa be, ji Hz.Adem bigire heta îro, ji îro bigire heta piştdawiyê (qiyamet), mêjiyên mirovan mîna kevirên domînoyê dê bibin palpişt. Li gorî vê vacê, ola îslamê rast dibêje. Mêjiyê mirovan mîrateyan ji rabirdûyê digire û dahatûyê ronî dike. Jixwe raman û tevgerîna mêjiyê bi riya pêlên elektrokîmyewî nîn e? Li gorî rêzikên fizîkê, di gerdûnê de tu tişt winda nabe. Di dema hewcedariyê de jî çima neyê dîtin?

Norologê German Carl Wernicke li piştê, di loba qada şeqaq a çepê de navendeke duyem a zimên vedîtiye. Li gorî Anatomîstê Frensî Paul Brocayê, qada Brocayê ya di loba pêş de, di mêjiyê de tekane nebe jî jêderkiya ramanan dike.

Afirîna miroveki ew qas jî hêsan nîn e. Çar hefte piştî bergirtinê, embriyoya ku dê di dahatûyê de bibe mirov, di nava xulekekê de nîv mîlyon noron (şaneya rehikê) çêdike. Di mehên pêş de noron di çirkeyê de du milyon sînapsan çêdikin û ji bo mizisînê (temas) dest bi çêkirina şaxikên hestyar dikin. Piştî zayînê mirov dengê diya xwe ji dengê biyaniyan vawêr dike ango ji hev vediqetîne. Di malzaroka diya xwe de deng û nînikên wê dinase. Di şilemeniya amniyotîk de (şilemeniya nava malzarokê ya ku dor li bebekê digire) hemû tevgerên dayikê bandorê lê dikin. Xwarin û vexwarin, stran û axaftin, tirs û birs, hêrs û şadî... *

Li gorî lêkolîna profesorê Enstîtuya Teknolojî ya Stevensê Dr. Johnson O'cannor, li ser 100 ciwanê ku di warê karsaziyê de perwerde dibe ezmûneke bi navê "pîvana gencîneya peyvan a kesan" disepîne. Piştî pênc salan ev encam derdikeve:

Hemû xwendekarên ku pûanên wan ên ezmûnê di koma % 10'a pêşîn de ne bûne amîrên kargêriyê, lê hîç kesek ji yên ku pûanên wan di koma % 25'a dawîn de ne nebûne amîrên kargêriyê.

Hema bi tenê ev lêkolîn jî di warê qedexekirina zimanê kurdî, bêmafhiştina zarokên kurd a ji zimanê dayika wan û bêparhiştina ji şarezatiyê rewşa karesatê radixe ber çavan.

Ramana bêyî peyvan nepêkan e. Zanîna peyvan mêjiyê (bi xwezayî jî ramanê) xurt dike. Gava ku zarok dest bi axaftinê dikin, beriya pêşîn bi peyvên kurt û hevokên kurt diaxivin, lê piştre her kesî matmayî dihêlin. Ew çi sosretî ye? Peyvên ji wan mezintir ji dev û lêvên wan diherikin. Ew embriyoya ku di xulekê de nîv milyon noron û di çirkeyê de du milyon sînapsan çêdike niha bûye maşîna axaftin û ramanê. Ji mêjiyê mirovan ji rûerdê pirtir kevir, zêr, maden, vejen û gewher derdikeve. Dibe ku ew zarok pê nizanin, lê em dizanin. Henry Ford, Birayên Wright, Marconi, Beethoven, Milton Erickson, Newton, Pascal, Darwin, Einstein, Konfuçyûs, Sokrates, Seîdê Kurdî, Kasparov û gelekên din...

*Jêderk:*

** National Geographic- Adar 2005*



# Hevkariya qirêj

**Li zindana Adra 33 roj in girtiyên kurd di grevê de ne 300 girtiyên PYD û PKK'ê dest bi rojiya birçîbûnê kirin ji bo dengê xwe bigihînin raya giştî û saziyên mafên mirovan ên navnetewî**



DILDARÊ AMEDÊ

Dewleta Sûriyeyê di salên dawî de siyaseta dewleta tirk a salên 80-90 de daye destpêkirin û bi taybetî piştî hin peymanên ku di dema dawî de di nava her du welatan de li dijî kurdan hatin îmzekirin bêtir zordestiya wan bêtir xwe da der û aşkeretir bû. Vê zordestiyê bi gelek şêweyan xwe da der û mînaka herî giring a ku em ê di vê nivîsê de li ser rawestin, zilm û zora ku li girtiyên siyasî tê kirin. Bê guman li hember vê rewşa nû tevgera siyasî ya kurd jî pêwîstbû ku xwe li gor şert û mercên nû amade bike û ew jî guhertinan di xebata xwe ya siyasî û şêwazên wê de çêbike.

Yek ji van şêwazên berxwedana tevgera kurd jî rojiya birçîbûnê ya ku berî 33 rojan li zindana Adra hatiye destpêkirin. Di 30'ê meha derbasbûyî de 300 girtiyên PYD û PKK'ê dest bi rojiya birçîbûnê kirin ji bo dengê xwe bighînin raya giştî û saziyên mafên mirovan ên navnetewî. Girtiyan tevî hemû zext û zordariya dewleta Sûriyeyê dan xuyakirin ku ew dê vê çalakiya xwe berdewam bikin heta ku hemû daxwazên wan werin cih. Dewleta Sûriyeyê bê ku tu giringiyê bide raya giştî an jî saziyên mafê mirovan ên navnetewî li şûna sererastkirina rewşa girtiyan zext û zordariyên xwe li wan zêde kirin û heta niha nahêlin ku ne dengê wan derkeve derve ne jî kesek ji malbatên wan bikaribin biçin serdana wan. Heta niha tu bertek û nerazîbûnên xurt nehatine li dijî vê zordariyê nehatine nîşan dan.

Ev barê han jî ji her kesî bêtir dikeve ser milê rewşenbîran ku bikaribin dengê girtiyên azadiyê bighînin hemû cîhanê, bi taybetî jî rewşenbîr û nivîskarên kur ên Rojavayê Kurdistanê ku li welatên Ewropayê dijîn, bikaribin bi nivîs û nûçeyên bi hemû zimanên welatê Ewropayê bihînin van welatan. Lê ya ji vê jî giringtir piştgiriya gel û lidarxistina çalakiyên cur bi cur li Rojavayê Kurdistanê. Em tev şert û mercên wî welatî dizanin ku bi riya dezgehên istixbaratê tê meşandin lê dema em bala xwe bidin Bakur pêwîste em şertên îro lê yên salên 80-90 bidin ber çavên xwe. Ji ber ku ev tiştên ku gelê kurd li Bakur bidestxistine bi bedelên giran û xwînê hatine standin, heta niha jî tu kîjan zeviyê Bakurê Kurdistanê bikolî tu yê rastî hestiyên mirovên welatparêz û berxwedêr bê.

Ev mînaka zordariyê ya ku niha hikûmeta Sûriyeyê li dijî tevgera azadîxwaz a gelê kurd dide meşandin beşeke ji sînaryoyên qirêj ên ku bi destê dewleta tirk hatine hûnandin. Bê guman ne tesadufê ku di heman demê de li Tirkiyeyê zextên li ser DTP'ê zêde bibin, şert û mercên tecrîda li ser rêber Apo dijwartir bibin. Di heman demê de li Îranê ciwanên kurd werin îdamkirin, di heman demê de zext û zordariyên li dijî PYD werin dijwarkirin.

Ev hemû di encama hevkariya dagirkeran tê meşandin. Hikûmeta tirk bi serkêşiya AKP, Erdogan û Davutoglu siyaseta dewleta tirk a înkar û îmhayê bi şêweyekî nû û rêbazên cuda dike û bi welatên din ên dagirkerên Kurdistanê re di nava têkiliyên cur bi cur de ye û serkêşiya vê yekitiya dijî kurdan dike.

Li dijî vê hevkariya qirêj a dewletên dagirker pêwîste ku gelê kurd jî bi yek dengî, yek dilî û yek helwestê li dijî vê konsepta nû ya şerê li dijî gelê kurd bi hevre tevbigerin. Pêwîste kurd jî êdî van sînorên dijminan ên ku di serê xwe de jî bicihkirine, ji serê xwe bavêjin û bi hev re tevbigerin. Ji bo her bûyerkê ku kîjan parçeyê Kurdistanê biqewime pêwîste di heman demê de hemû parçeyên din jî bikevin nava liv û tevgerê, ne tenê li welat li hemû aliyên cîhanê.

## Greva birçîbûnê kete roja 33'an

**GREVA** birçîbûnê ya 300 girtiyên kurd ên li girtîgeha Edra ya paytexta Sûriye Şamê roja 30'ê cotmehê dest pê kiribû ket roja 33'an. Agahiyên ku malbatên girtiyan û saziyên mafên mirovan radigihînin tenduristiya girtiyên kurd her diçe xirabtir dibe. Tevî ku 33 roj qediyan jî hîn rayedarên Sûriyeyê destûr nedane malbatên girtiyan ku zarokên xwe ziyaret bikin û bersiveke erênî nedane girtiyan. Malbatên girtiyan ji ber tenduristiya zarokên wan ên çalakvan bi fikar in. Naye zanîn ku dê çalakiya çalakvanên girtî yên kurd heta kengê dê bidome û der barê tenduristiya wan de jî tu agahî nayê bidestxistin.

# Peykerê mirovahiyê çêdike

## Ciwanê kurd Hîdayet Taşan ku 13 sal in peykeran çêdike niha li ser projeyeke ku 2 salan bidome radiweste û dixwaze bi vê projeyê dîroka mirovahiyê ya 10 hezaran sal berê çêbike û li Ewropa û Amerîkayê pêşkêş bike



Erdal ALIÇPINAR - BONN

Ciwanê kurd Hîdayet Taşan li bajarê Bonna Almanyayê peykersaziyê dike û niha li ser projeyeke ku zarokekî piştî 3 mîlyon salan ji dayik bibe dê di rewşeke çawa de be radiweste. Taşan der barê projeyê de wiha got: “Zarokekî ku piştî 3 mîlyon salan ji dayik bibe. Projeyeke ku perisîna mirovan ber bi ku diçe û vegotina rêwîtiya perisîna mirovahiyê. Zarokê ku ez çêdikim bi qasî 70 û 75 cm ye û rewşa beriya ji dayikbûnê vedibêje. Ger bibêjin çima tiştekî wiha, ji ber ku dema mirov li bejna jinan a 3-4 mîlyon sal berê dinêre 110 cm û kiloya wan 25 û îro jî bejna jinan ji 160 cm dest pê dike û heta 2 metreyan diçe encameke wiha derdikeve holê.”

**‘Bejna mirov dirêj dibe’**

Taşan gotinên zanyaran bi bîr xistin û wiha pê de çû: “Li gorî lêkolînên zanyaran jî derket holê ku bejna mirovan li gorî 50-100 sal berê 5 û 10 cm dirêj bûye. Ger nifşê mirovan neqede û felaket dernekevin û tiştekî cuda neqewime piştî 3 mîlyon salan encameke wiha derdikeve holê.”

Taşan berê projeya ‘Şahmeran’ jî pêk anîbû û got ev mîtolojiyeke 2 hezar 300 sal berê ye. Her wiha Taşan tenê peykeran çênake, kêlikan jî çêdike. Ev projeya Taşan projeyeke zanistî û hunerî ye. Di projeya ku 2 salan dom bike de çêkirina 70 berheman cih digire. Taşan bilêv kir ku xebatên projeya xwe di Muzeya Dewletê ya Bonnê de pêk tîne û wiha got: “Xebat ji peykeran pêk tê. Xebatên min ji koka daran pêk tê dê koka darên mezin bin. Ev jî berbûna wan 60-70 cm û dirêjiya wan 7 metro ye. Ez ê hemû peykeran çêbikim û yek bi yek bi vê darê ve monte bikim.”

Taşan anî ziman ku di xebata wî de li herî jêr cûreyê meymûna ku dişibe mirovan cih digire û wiha axivî: “Hinekî li ser vê jî tiştên ku li Mezopotamyayê hatine dîtin bi cih bikim. Dîsa dê Misirê vebêje, çermsorên ku li Mayayê vebêje. Her wiha dê mîrateyên bilind û girîng vebêje. Ez niha li ser van xebatan disekinim. Ev xebat jî dê 2 salan bidome.



### ‘Bi pel teknolojî pêş ket’

TAŞAN destnîşan kir ku hezaran sal berê mirovan li kew û xwezayê nihêrtin û di encamê de balafirên teknolojiyê hatin dîtin û vê yekê tesîreke mezin li ser pêşveçûnên teknolojiyê kir. Taşan dê ji bo vegotina van pêşveçûyînan pel bi kar bîne. Her wiha di nav projeyê de pêşketina teknolojiyê û dîtina balafirê jî cih digirin. Taşan da zanîn ku dixwaze projeya xwe li Amerîka û Ewropayê wekî pêşangehekê li dar bixe û wiha got:

“Ev xebat xebateke ku aştî û biratiya mirovan vebêje ye. Mînak di nav vê xebatê de axaftina mirovan jî cih digire. Mînak axaftina mirovan bi qasî 100 hezar sal berê dest pê kiriye. Yekem car li Mezopotamya û Afrîkayê dest pê kiriye. Li Ewropayê jî 40 hezar sal berê axaftin dest pê kiriye. Lê li ser axa me 100 hezar sal berê dest pê kiriye. Ango di navberê de 60 hezar sal hene. Lê îro em dinêrin ku rewşeke berevajî heye.”

Taşan bilêv kir ku li Ewropayê dema mirov nû bi amûran re mijûl dibûn li ser axa Mezopotamyayê mirovan peyker û wêne çêdikirin.

# Ji hunermendê tunusî stranên kurdî

CELÎL DEMÎRALP / KOLN - ANF

Hunermend Emel Mathlouthi li Tunusê ji malbateke rêzê ji dayik bû û di demeke kurt de di nav hunermendiyê de cih girt. Hê 7 saliya xwe de pêşandanên kûçeyan yên biçûk li dar dixist. Emel Mathlouthi, îro bi kurdî û gelek zimanên din distrê.

Hunermenda tunusî Emel Mathlouthi besteyan çêdike, stranan dibêje û bi tarzê xwe yê nû reng dide muzîka Tunusê. Emel di sala 1982’an de ji malbateke ji rêzê ji dayik bû. Di temenê biçûk de bi muzîkê re eleqedar bû û hê 7 saliya xwe de bi koreografî, skeç û stranan ve pêşandanên kûçeyan li dar xist û organîze kir.

Emel piştî 10 saliya xwe bi dest gotina stranan dike, demekê bi şanoyê re eleqedar dibe lê piştî demekê dîsa dest bi gotina stranan dike. Eleqeya wê ya ji bo stranbêjiyê ji şanogeriyê girantir derdikeve. Li zanîngehê tevî komek hevalên xwe derdikeve ser dikê û di 19 saliya xwe de derdikeve turneyan û bi tarzê rock distrê.

**Rastiyên jiyanê distrê**

Hunermenda tunusî di 22 saliya xwe de bi tarzê solo stranan dibêje û di heman demê de gîtarê jî hîn dibe. Di jiyana wê de noqteya herî girîng jî ew e ku hunermendê lubnanî Marcel Khalifa nas dike. Sêx Melayê misirî ji bo tarzeke cûda alîkariyê dide û serhildana hundirê xwe tîne ziman. Yekem besteya profesyonel a hunermend strana ‘Khaief’ e ku vê stranê di sala 2004’an de çêdike. Êdî di wê baweriyê de ku divê hemû kes bi zimanê xwe yê zikmakî bistrê û xwe bi zimanê xwe bîne ziman. Yekem albuma wê jî bi navê vê stranê derdikeve û di vê albumê de 7 stranên bi tarzên cuda cih digirin.

Dema li Parîsê hunermendekî penaber e bi navê Helma albuma xwe ya duyem derdixe û di vê albumê de 8 stran cih digirin.

Emel di sala 2006’an de di pêşbirka radyoya RFI’ê ya muzîkê de dikeve dereceyê û di gelek sahneyên navûdeng de derdikeve û konseran dide. Di stranên wê de mirov dibîne ku bi awayekî otobiyografya wê jî tê vegotin. Ev rastî êş û bûyerên ku giran jiyane vedibêje.

**Beşdarî merasîmê bû**

Her wiha dîsa di dengê wê de hest, evîna jiyanê, bedewî û xweşikbûna tiştên biçûk, bêhêwîtî, li hember xirabiyên cîhanê têkçûna xeyalan, li hember derketina kevneşopiyan, peyman, tecrube tên stirîn. Dîsa girîngiya ziman û nasnameyan bi stranên xwe ve tîne ziman.

Di nav van stranan de strana kurdî ya bi navê ‘Ahmedo’ jî cih digire. Emel di 7’ê mijdarê de beşdarî merasîma xelatdayînê ya 17’emîn Pêşbirka Çîrok û Helbestan a Huseyîn Çelebî bû. Emel di merasîmê de strana Kazim Koyuncû ya bi navê ‘Ben Senî Sevdugîmî’ û strana erebî ya bi navê ‘Che Guevera’ got û rastî eleqeyeke mezin hat. Kesên bixwazin dikarin ji vê navnîşanê li strana Emelê guhdar bikin;

***Ji bo strana kurdi: http://www.youtube.com/watch?v=NeJR6m4yRhY&feature=related***

***Ji bo strana tirkî: http://www.youtube.com/watch?v=7IDPJvVLmpk***

***Ji bo strana Che Guevara: http://www.youtube.com/watch?v=cb27bXBH5sU***

# *Farid Farjad tê Tirkiyeyê*

Hunermendê binavûdeng Farid Farjad dê bi çarçoveya organîzasyoneke taybet li Tirkiyeyê bajarên wekî Enqere, Îzmîr û Stenbolê konseran bide.

Vîztuozê kemanê yê navûdeng Farid Farjadê îranî dê di çarçoveya orgnîzasyonekê de di 4’ê kanûnê de li Enqereyê, 6’ê kanûnê li Îzmîrê, 8 û 11’ê kanûnê jî li Stenbolê konseran bide û bigihêje hezkiriyên xwe.

Hunermend Farid Farjad di sala 1938’an de li Tehranê ji dayik bû. Di sala 1966’an de di Konservatuvara Muzîkê ya Tehranê de mastir kir. Salên dirêj di nav xebatên Orkestraya Senfoniyê ya Tehranê de cih girt.

Di pêşketina muzîka farisan de xwedî cihekî girîng e. Herî dawî bi navê An Roozha 4 rêzealbumên wî derketin. Her wiha xebateke wî ya kolektîf ku bi Orkestraya Golhayê pêk anîbû jî heye. **STENBOL**

www.arsivakurd.org

# Qerf û Henek



Îkram Balekanî
balekani@hotmail.com

## “Qendîlos Ocalanos”

Hefteya derbasbûyî, du rojên girîng û du cejin hebûn. Roja 25'ê Mijdarê, yanî roja Têkoşîna li Dijî Şîdeta li Hemberî Jinê û Roja 27'ê Mijdarê yanî sazbûna PKK'ê û Cejna Qurbanê. (Wele barê min giran bû, ez ê çawa ji navê derkevim, ez jî nizanim.)

Bi minasibeta roja 25'ê Mijdarê, hin çalakî pêk hatin. Jin daketin kolanan û wekhevî xwestin. Min jî xwest ez tiştekî bikim. Ez fikirîm ku çi bikim. Min got ya herî baş, ez hin serpêhatiyan bêjim, da ku derdora min jî hişyar be û bibzane çiqas neheqî li jinan tê kirin. Min hin serpêhatiyên xemgîn gotin. Paşê hin bûyerên nexweş ku ser navê namûsê pêk tên. Min dît ku bala kesî nakişîne. (Yekî got heyran, terka namûsa bênamûs bike...)

Min taktîk guherî û dest bi “çîkan” kir. Yanî kî zanî ev çi ye, filan û bêvan... Min dît dîsa nabe, min got ka ez pirse-mesela bêjim.

Min yek got û bersivek ecêb bihîst. Lewre ez dixwazim bi we re jî parve bikim. Mesele wiha ye. Rojekê, Heciyek, meleyek û sofiyek tevî jinên xwe diçin seferê. Tenê hespekî wan heye. Diçin qeraxa çem Dicle disekinin. Hemû nikarin bi hev re derbas bin. Baweriya Hecî, Mele û Sofî jî bi hev tuneye. Lewre yek jî wan jî naxwaze jina xwe bi tenê bihêle. Pêwîst e çawa derbas bin ku dilê kesê nemîne?

Îja yekî got heyran ez bersiva wê dizanim. Min got; ezbenî, keremke bêje ka bersiv çi ye, wê çawa derbas bin?

Got, pêşî, du jin li hesp siwar dibin û diçin. Yek dimîne, yan din jî hesp paşve vedigerîne û tê jina din jî bi xwe re dibe. Her sê jin û hesp li aliyê çem in, Hecî, Mele û Sofî jî li aliyên din dimînin. Di vê navberê de gerîla tên û jinan bi rêxistin dikin, jin tevlî gerîla dibin û ji zilma mêran xilas dibin. (Bi rastî ez ne li benda bersiveke wisa bûm, ez pir pê keniyam.)

Ya rastî bersiv heye, bersiv dirêj e, ne wisa ye. Lê gava wisa got, ez fikirîm. Min got heyran tim dibêjin PKK'ê civak guherî, gel guherî, hin kes bawer nakin. Wele bi rastî jî PKK'ê qedera kurdan guherî. Kêm maye ku metelok û pêkenokên me jî biguhere.

Me got PKK. Belê roja 27 Mijdarê hem cejna sazkirina PKK'ê hem jî cejna Qurbanê bû. (Her du jî li we pîroz bin.)


Bi minasibeta cejnan, di Rojtv de jî şahiya pîrozbahiyê hate weşandin. Di wir de babê helbesta nûje ya kurmancî, Ehmed Husênî helbestek xwend. Pêşî ku derkete ser sehnê, dest bi axaftinê kir, bi rastî min nezanî xeber dide yan helbestê dixwîne. Ji gel re digot, rûnên, rabin. Piştî çend deqe deras bûn, min nû fam kir ku hêj dest bi xwendina hehbestê nekiriye. Paşê got ez ê niha helbestekê bixwînim ku navê wê “Qendîlos Ocalanos” e


Lê tişta balkêş ev bû ku Ehmed Husênî digot: “Kurd tenê pêwîst e ji du tiştan re bibêjin, her bijî. Yek Ocalanos e, yek jî Qendîlos e. Paşê dest bi xwendina helbestê kir û di dawiyê de jî hemû kaxez û maxezên xwe avêtin erdê û got, Ocalanos, bila hemû helbest bi qurbana te bin.

Lê mixabin hin kes hê jî naxwazin fam bikin ku çima Ehmed Husênî wisa got. Ew kesên ku nizanin çima helbestvanek helbestên xwe bi qurbana rêberê kurdan dike, bila here hinekî dîroka Kurdistanê û zilma li ser gelê kurd bixwîne, wê fam bike. Ku dîsa jî fam nekir, hema bila erd biqelişe û ew têkevin erdê baştir e. Ku kede erdê jî fam nekir, bila here serê xwe li dîwaran bixe, dibe ku hişê wan bê serê wan. (Lê min hê jî fam nekir, ji bo çi Qendîlos Ocalanos! Jixwe min bizaniya wê çaxê taybetiya Ehmed Husênî nedima ne wisa!)







## XAÇEPIRS



**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Birayê diya mirov... Baneşana kêfxweşiyê... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **2.** Rojek... Zîl, kulîlkên nû vedibin re tê gotin... Teref **3.** Şiv... Rengek **4.** Kund **5.** Çiyayekî me **6.** Alif, xwarina sewalan... Ajala xwedî têjik... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax **7.** Erkedarê ku di keştiyan de xizmeta rêwingan dike **8.** Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê... Notayek... Beyreq, sembola welatan **9.** Cure, celeb... Kurteya piştî zayînê

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** (Şîrê ...) Şîrê cara yekemîn ê di pey zayînê de ye, ku rengê wê zerik e... Bajarekî me **2.** Berhema ku nivîskarê wê nediyar e... Yezdanekî misrî **4.** Oda keştiyan **5.** Boyaxa neynûkan ... Mektûb **6.** Kurtebêja Antîmonê... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye? **7.** Alet, malzeme... Sir, tiştê her kes pê nizane **8.** Dinya, cîhan... Heyf **9.** Navê perestgeha mesîhiyan... Herêmeke me

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | K | E | L | A | M | | Ç | Ê | J |
| 2 | A | B | | B | Î | S | O | K | Î |
| 3 | T | A | L | Î | | A | V | | R |
| 4 | O | | Î | S | A | L | | K | |
| 5 | | E | M | | W | | K | I | N |
| 6 | J | | A | D | I | L | | Z | O |
| 7 | E | Ç | | Û | R | | K | Î | |
| 8 | N | | Ê | M | | B | E | R | G |
| 9 | G | E | L | A | W | E | J | | A |



DR. DILGEŞ
dilges_dilges@hotmail.com

## Benikê dû hebanê

Berî ku kekê Dilawer Zeraq li min bigere û vê biwêjê bipirse ka di kîjan şertan de tê bikaranîn hema ez bi wateya wê dest pê bikim û piştre pêdeçûnekê di gotara xwe de bikim û mijara 300 ewroya Şêx Zubêr jî bi we re parve bikim.

'Benikê dû hebanê' biwêjeke xas kurdî ye û gava kesek di karekî de xwe bêdeng bike û bibêje 'hema ez jî tabiê we me' radibe dibêje, “Ez jî benikê dû hebanê' û xwe lal û kerr dike û dibe 'wetentaşekî baş' (Wetentaş, bi kurdiya kal û pîrên me vatandaş e bi tirkî ye)

Piştî ku bernameya me 'Doxtorê Dînan' bû 'benikê dû hebanê' û me toz ji weşana zindî û gundî rakir, niha jî ji bo bernameyê 'welettaşên' kurdîaxêv peyda nabin.

Hema kî min dibîne, dibêje, “Wele çavê mino, tu pir xweş xeber didî, lê em tiştekî ji qonişmaya te annamiş nabin, hema carekê jî zehmet nebese ca kilamekê jî bêje da ku keyfa me were cî”

Wey li minê, welle heyran heke ez rabim dest bi stranekê bikim hûn ê heft gundan ji ber dengê min birevin.

Ma ne, bi qewlê kekê Dilawer dengê min ne nexweş e, dengê min tune ye.

Yanî dengê min jî benikê dû hebanê ye, heban biçe ku ew bi dû ve ye.

Xwînerino, heçî meseleya 300 ewroyan e, ew bêbextiyeke reş e. Nizanim ka hayê we pê heye an na, lê bila we ji min nebihîstibe, heçî Şêx Zubêr e, ji Teyîb Erdogan bêhtir digere; hema bêjin tav qet lê naçe ava, çimkî danê sibê li Hindistanê ye, piştî nîvro li Avustralyayê, hema tûra cîhanê temam dike, hema her ber tavê ye. Bi ser de tê timahiya 300 ewroyan dike.

De hema bêjim 'Bila xwedê çavê te têr bike gerokê erd û asîmanan! Heke di nav gera te de wexta te çêbû ku riya te bi welatê me jî ket, ji kerema xwe 300 ewroyên min bîne!...'

Ez nivîsa xwe dirêj nakim…

Ez vinnn û hûn çi bikin, ne xema min e!

## Qûna tirek

Sefero mirovekî tirek bû. Dema ku tenê dima tir û fisên xwe bi hêsanî û serbest dikirin. Ji berê ve bapîrên me gotine: “Qûna ku elimî tiran; rast nabe ta kurê kuran.” Gelek caran li pêş endamên malbatê û cîranên xwe jî dikirin; ango malbat û cîran bi tirekiya wî hesiyabûn…

Rojekê dema xwe di ser coka di keviya kolana Nisêbînê ku servekirî diherikî re davêje; tirekê dike. Ji nişkê ve dibêje: ” Eee hek! Wele ji zoran re bû. Bêhemdê min bû.”

Dûre li der û dora xwe dinêre ku kesek tune; dengê tira wî neçûye kesekî; li xwe vedigerîne û dibêje:

- Bi Xwedê ji roja roj de tu ev tirek î, îca baş e ku deng neçû kesekî.

Danhev: Hozan Azad



www.arsivakurdi.org

# Çîrokên ji Berîka Pêşî: Mêzêna Xêr û Gunehan

Eywana dadegehê bi şêweyekî hêsan raxistî bû, weke dadgehên zemînî bû; ji ber sedemên, ku winê nêzîk nas bikin, xaça, ku dîdevan pê sûnd dixwin li wir nebû. Dadvan sisê bûn, bi tevayî sere bûn, rihspiyên giran xwediyên rûyên hişk û ziwa

KAREL ÇAPEK

Mêrkujê gelek caran, mêrkujê bi nav û deng, ê ku gelek fermanên girtinê di derbarê wî de hatine der û yê ku keriyek polîsan û detektîv li pey digerin; tawanbar Kugler daxuyaniyek da û got, ku ew hemû jî ti caran nikarin wî bigirin û bi rastî jî negirtin, bi kêmayî bi saxî ew negirtin. Kuştina polîsê dawî, di zik hev de ew xwîna polîsê nihan bû ku ketibû sûyê Kugler de. Vî polîsî jî dixwest Kugler bigire. Kugler çend gule jê xwaribûn, rast e, lê wî yê polîs kuşt. Birînên Kugler heft bûn, ji wan sisê bi timamî kujdar bûn. Bi vê serpêhatiyê ew ji dadamendiya zemînî rizgar bûbû.

Mirina Kugler wilo zû hat, ku êdî wext pêre nebû, da bi ti êşê biheste. Dema canê wî dev ji laş berda, wî karîbû têr ji xwe re li ser ecêbên wê dinyayê matmayî bimêne, ew dinyaya bê dîmen, spîçolkî û ta nemayê vala, lê canê wî matmayî nema. Mirovê ku li Amerîkayê di zinadanan de mayî, ji xwe re wê dinyayê jî hema weke jiyangehek nû dibîne, tê de jî bi hinek mêranî mirov dikare cihekî xwe li pêş, weke li her derî, bibîne.

Dawî bêçare roja Kugler jî ya Xêr û Gunehan hat. Ji ber ku li ezmanan her û her rewşeke sermedî, ya awarte heye, ew li şûna ku were ber sûndxwariyan, weke ku li gor tawanên xwe divabû hatibana, ew hate ber encûmenekê. Eywana dadegehê bi şêweyekî hêsan raxistî bû, weke dadgehên zemînî bû; ji ber sedemên, ku winê nêzîk nas bikin, xaça, ku dîdevan pê sûnd dixwin li wir nebû. Dadvan sisê bûn, bi tevayî sere bûn, rihspiyên giran xwediyên rûyên hişk û ziwa bûn. Formalîte hinekî kelê bûn: Kugler Ferdînand, bêkar, di filan rojê de bûye, di bêhvan rojê de miriye... Li vir hate xuya kirin, ku Kugler nizane kîjan rojê miriye; wî di cih de dît, ku ev nezanî wê ziyanê bigehêniyê, ew di cihê xwe de hişk ma.

“Tu xwe bi çi gunehkar dibînî,” serdadvan pirsî.

“Ne bi ti tiştî,” Kugler bi serhişkî got.

“Dîdevan bênin,” serdadvan keserek kişand.

Li hemberî Kugler kalekî mezinî weke bertelaşkî, hema bêpîvan mezin, rûnişt, xeftanekî şînî bi stêrikên zêrîn neqişandî lê bû; bi hatina wî re dadvan rabûne serxwe, û Kugler jî rabû ser piyan, bê viyana xwe matmayî mabû. Piştî ku yê kal rûnişt, ji nû dadegeh jî rûnişt.

“Dîdevan,” serdadvan dest pê kir, “Xwedayê Mezin, vê Encûmena Dawî, win xwestine, da di babetê Kugler Ferdînand de win şehdebûnê bidin. Tu Rastaxêvê herî Mezin, pêwist nake ku tu sûndê bixwî. Ez ji we dixwazim, ji bona giriftarê, ku win ji mijarê dûr nekevin û nedine pey hûrekên, ku girêdana wan bi pêlkirina qanûnê re nîne. Û win, Kuglero, axaftina dîdevan nebirin. Her tişt xuya ye, tu bidî mandelayê jî, pûç e. Fermo bere birêz dîdevan, bibêje.”

Serdadvan wilo got, bi rehetî herdû anîşkên xwe danîne ser masê û berçavkên zêrîn jêkirin, xuya bû ku ew xwe ji axaftina dîdevanî dirêj re amade dike. Kaltrîn endamê dadvaniyê keysa xwe li xewê xweş kir. Ferişt, nivîskarê dadegehê, pirtûka jiyanê vekir.

Dîdevan Xwedê hinekî kuxî û dest pê kir:

“Erê, Kugler Ferdînand. Ferdînand Kugler, kurê karmendê fabrîkeyê, hê ji piçûkayî de zarokekî nehs bû; lo lawo, tu çi xirab bûyî! ji dayika xwe pir hez dikir, lê fehêt dikir vê bide der; ji ber vê ew zirz bû û bi ya ti kesî nedikir. Tê bîra te, çaxê ku te tiliha bavê xwe gez kir, dema wî xwest li te bide, ji ber ku te kulîlk ji bexçê nivîskarê dadperweriyê dizîbûn?”

“Ew kulîlk ji Îrma keça tehsîldar re bûn,” hate bîra Kugler.

“Ez dizanim,” Xwedê got. “Hingî ew heft salî bû. Û tu nizanî piştre çi pê hat?”

“Nizanim.”

“Mêr kir, Oskar kir, kurê xwediyê fabrîkê; wî ew necisand û dema beravêt mir. Ma Ruda Zaruba tê bîra te?”

“Ma çi bi wî hat?”

“Kuro, ew bû keştîvan û li Bombayê hate kuştin. Win herdû ji hemû zarokên bajêr xirabtir bûn. Kugler Ferdînand hêdeh salî bû dest bi diziyê kir û her û her derew dikirin; diçû nav civatên pîs, weke ya serxweş û parsek Dlabola, yê ku pêre xwarina xwe leva dikir.”

Dadvan destê xwe hejand, weke ku bibêje ev der ne cihê van gotinan e; lê Kugler bi xwe pirsî:” Û... çi bi keça wî hat?”

“Bi Marîka?” Xwedê got. Ew bi yekcarê filitî. Çardeh salî mêr kir, bîst salî mir û diber zikratan de tu hatî bîra wê. Tu çardeh salî bûyî, tu serxweş ketî û te ji malê bazda. Bavê te gelek kul û derd xwarin û dayika te weke baranê hêstir barandin; te mala xwe bêrûmet kir, û xwîşka te, xwîşka teyî spehî Martîçka, zava nedît, zavayê ku were mala dizan. Hêjî bi tenê, li ser xêr û qenciyên bi ingûşk, yên ku xelkên dilovan wê pê birîndar dikin, di xizaniyê de dijî.”

“Niha di vê kêliyê çi dike?”

“Di vê kêliyê de ew li dikana Vlk e û tê dikire, da berî tarî bikeve, karibe bidirû. Ew dikan tê bîra te? Te carekê li wir xareke camî kirî, tu hingî şeş salî bûyî; û hê roja pêşî te xar winda kir û te êdî ew nema dît. Tê bîra te, tu çawa hingî ji kerb û xeman girî?”

“Ew hingî gindirî kû?” Kugler bi dilbijî pirsî.

“De ew gindirî şirikê. Ma ne, kuro, ew hêjî li wir e, ev sih sal di ser e derbas bûne. Ha di vê kêlîkê de li ser erdê baran dibare û xara camî di nav ava sarî bi xuşîn de dilerize.”

Kugler dilşikstî serê xwe tewand. Lê serdadvan berçavka xwe danî ber çavên xwe û bi nermayî got: “Dîdevano, dive em werine ser mijara xwe. Yê sûcdar kes kuştiye yan na?”

Xwedayê dîdevan serê xwe hejand. “Neh kes kuştine. Yê pêşî di pevçûnekê de bû. Ew kete zîndanê û ew li wir xeyisî. Ya din yareke bi paşmêr bû. Ji ber wê cezayê mirinê danê, lê wî bazda. Yê sisiyan kalek bû, ku Kugler hat ew dizî. Yê çaran nobedarekî şevê bû.”

“Ma ew mir?” Kugler kire qêrîn.

“Ew piştî sê rojan mir,” Xwedê got, “bi êşeke dijwar û şeş zarok li pey xwe hiştin. Yên pênc û şeşan du jinûmêrên pîr bûn; ew bi balte kuştin û bi tenê şazdeh kron bi wan re dîtin, di wextê, ku wan bêhtirî bîst hezar kronî veşartibûn.”

Kugler xwe çend kir: “Li kû, ezbenî!”

“Di nav doşekê de,” Xwedê got. “Di kîsikekî hîzar de, li nav doşekê ew pereyên ku bi ribayê û bi kurbûnê maliştibûn, veşartibûn. Yê heftan li Amerîkayê kuşt; ew penaber bû, hevwelatiyê Kugler bû, weke zarokekê bêçare bû.”

“De naxwe ew di nav doşekê de veşartibûn,” Kugler matmayî kire pistepist.

“Erê”, dîdevan berdewam kir. “Mirovê heştan, yekî peyade bû, ew kete devê riya wî de, çaxê ku bi pey diketin. Hingî periwên dinanên wî kul bûbûn ji êşan sewdan di serî de nemabû. Kuro, te jî gelek êş û derd xwarin. Yê dawî polîsek bû, ku hema berî bimire, geha wî bikuje.”

“Wî çima kuştin dikir?” serdadvan pirsî.

“Ew jî weke her kesî,” Xwedê bersiv da; “ji torebûnê, ji bona bidestxistina peran, carnan bi plan û carnan ji kurfelaqî ve, carnan ji kêfa dilê xwe re û carnan jî ji mecbûrî bû. Ew destvekirî bû û carnan alîkariya xelkê jî dikir. Bi jinan re qenc bû, hez ji lawiran dikir û xwediyê soza xwe bû. Ma ez qenciyên wî bibêjim?”

“Spas,” serdadvan got, “ne gerek e. Sûcdaro, tiştek heye ku tu ji bona parastina xwe bibêjî?”

“Na,” Kugler bêpêçdan got; ji ber ku êdî jê re her tişt weke hev bû.

“Dadegeh wê xwe bikişêne ji bona şêwerdariyê,” serdadvan ragehand, û hersê dadvanan xwe dûr kirin. Xweda û Kugler mane di eywana dadegehê de.

“Ev kî ne?” Kugler pirsî û serê xwe bi hersêkên dûrdiketin ve kir.

“Mirovên weke te ne,” Xwedê got. “Li dinyayê dadvan bûn, û li vir jî dadvaniyê dikin.”

Kugler tilihên xwe gez kirin. “Min hizir dikir... ma ne, min guh nedida meselê, lê min goman dikir, ku gerek e te dadvanî kiribana, ji ber ku tu... ji ber ku tu...”

“Ji ber ku ez Xweda me,” kalê mezin gotina wî tewa kir. “Lê ji xwe ev e mesele, tu dizanî? Ji ber ku ez bi her tiştî dizanim, ez ji binî nikarim dadvaniyê bikim. Jixwe ev yek nabe. Ne tu nizanî Kuglero, bê kê hingî gilehê te kir?”

“Ez nizanim,” Kugler matmayî got.

“Lucka, ya berdestîka meyxanê, ji zikreşî gilehê te kir.”

“Li min negirin,” Kugler zirav da xwe û got, “lê we jibîr kir bibêjin, ku min li Chicago ew Teddyê pîs kuşt.”

“Na bavo,” Xwedê bi rikberî got, “Ew jê fistiqî û hêjî sip û sax dijî. Ez dizanim, ew gelac e; lê wekî din, kuro, ew mirovekî pir baş e û zaf hez ji zarokan dike. Hema wilo behwer neke, ku kesek hebe bi yek carê pîs be.”

“Çima jixwe win... çima tu, Xwedayo, bixwe dadvaniyê nakî?” bi ramanî Kugler pirsî.

“Ji ber ku ez bi her tiştî dizanim. Heke ku dadvanan bi her tiştî, bê kim û kurî bi her tiştî, zanibe, dê ew jî nikaribin dadvaniyê bikin; bi tenê wê di her tiştî bigehin, ta ku dilê wan ji ber biêşe. Ma ezê çilo te tawankar bikim? Dadvan bi tenê bi ziyan û gunehên te dizane; lê ez her tiştî li ser te dizanim. Her tiştî Kuglero. Ji ber wê ez nikarim te tawankar bikim.”

“Nawxe vêca çima... ev xelk... li ezmanan... dadvaniyê dikin?”

“Ji ber ku mirov yên hev in. Ez, weke ku tu dibînî, bi tenê dîdevan im; lê ceza, tu dizanî, li ser cezê mirov biryarê didin- li ezmanan jî. Ji min behwer bike Kuglero, ev di cihê xwe de ye; ti dad ji ya mirovanî pê ve bikêrî miorvan nayê.”

Di wê kêlîkê de dadegeh ji şêwermendiyê vegera û serekê Encûmena Dawî bi dengekî bilind biryar got: “Kugler Ferdînand ji ber neh caran li pey hev tawan û mêrkujiyên plankirî kirine, ji ber kuştin û diziyê, ji ber dubarekirina tawanan, ji ber hilgirtina çekan, ya bêdestûr û ji ber diziya kulîlkan tu hatî cezakirin, cezayê te dojeh e, tê ta nemayê di dojehê de bimênî. Pêkanîna cezê yekser cih digire. Fermo, doza peyre bênin. Ka sûcdar Machat Frantîşek li vir e?”

*tirej.net*
*Werger: Zagrosê Hajo*

# Tavilê vê spêdeyê



*pencera dilê min*
*vebû dilê te.*

*Mat mam*
*dema min dît*
*ku navê tu pê gazî min*
*dikî*
*li ser pel û kulîlkên*
*axlêveyê nivîsandî bû,*
*û mit rûniştim.*
*Perdeya ku stranên min*
*ji yên te cuda dike*
*kêlîkekê xwe veda*
*aliyekî.*

*Min dît ku ronahiya*
*spêdeya te*
*miştî stranên lal e,*
*stranên nestrandî mayî.*
*Ramîm ku dê demek*
*were*
*ku wan li ber piyên te*
*binasim*
*û mit rûniştim.*

*RABINDRANATH TAGORE*
*Werger: Husein Muhammed*

www.arsivakurd.org

ROJEV
1 Kanûn 2009 Hejmar: 19 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

# Tûra cîhanê ya etîk û ekolojîk



## Bi tenê bîsîklet û kargo

5 ciwanên ku di nava wan de hokabaz, hunermend û palyaço jî hene ji bo tecrubeyeke etîk û ekolojîk derketin tûra cîhanê. Tura wan di 9'ê îlonê de dest pê kiribû û dê di îlona 2011'an de bi dawî bibe

5 ciwanên ku temenên wan di navbera 22 û 24'an de ye, ji bo tecrubeyeke etîk û ekolojîk bijîn, bi bîsîkletê derketin tûra cîhanê.

Komeke ciwanan ku di nav wan de hokabaz, hunermend, palyaço jî hene, di nîsana 2008'an de bi navê "Zârmaloulouks" komaleyek damezirand. Ciwanan, niha jî biryar dan ku bi bîsîkletê derkevin tûra cîhanê.

Tûra ciwanan di 9'ê îlona 2009'an de dest pê kir û dê di îlona 2011'an de bi dawî bibe. Ligel wan tenê amûrên hokabaziyê, gîtar û pozên sor ên palyaçoyan heye.

Geşta ku li Parîsê dest pê kir hêj jî di nav Fransayê de dom dike. Ciwan dê li welatên wekî Îtalya, Tirkiye, Îran, Hindistan, Çîn û hin welatên Afrîkayê bigerin.

### Rojê 4 euro

Kom, li her derê ku lê bisekine dê bi zarokan re bicive û xwepêşandanan bikin. Bi vî awayî dê di nav zarokên ku hev nas nakin de zimanê xwepêşandanê yê navneteweyî bi kar bînin. Geşta xwe bi bûtçeyeke gelek biçûk dikin. Di rojê de serê mirovî 4 euro dikeve. Kom, çend meh berî ku derkevin geştê bi hin xwepêşandanan û kincên ku firotine fînansmanek ji bo geştê amade kirine. Lê ligel 4 euroyan, ramaneke erênî, etîk û ekolojîk jî di dilê xwe de bi cih kirine.

Li gorî hinekan, ev geşta ku bi pozên sor ên palyaçoyan û bi di nîvî de hiştina perwerdehiyê, bêberpirsyarî ye. Lê ew dibêjin ku berî derkevin geştê, bûne xwedî tecrube û xwedî berpirsyarî. Malbatên wan jî êdî fikarên xwe tune kirine. Di ev du salan ku dê li cîhanê bigerin de dê ciwan di gelek azmûnên jiyanê re biborin.

Aliyekî mezin ê geştê dê bi bîsîkletê pêk bê. Lê dê bi kargoyan biçin cihên ku bi bîsîklet nagihîjê. Endameke komê di vîdeoya xwe de got ku dê li balafiran siwar nebin û heta ji destê wan bê geşteke ekolojîk pêk bînin û wiha got: "Dema ku mirov li balefiran siwar dibe, tenê cihê ku lê siwar bûye dibîne û cihê ku jê peya dibe dibîne. Mirov nikare ji vê re bêje geşt. Em bi bîsîkletê derfet dibînin ku dema xwe bi tecrûbe û dersên taybet derbas bikin."

Endamên komê wiha pê de çûn: "Em dixwazin, heta ji destê me bê amûrên ekolojiyê qirêjî dikin bi kar neynin û geşteke ekolojîk pêk bînin." Di çarçoveya feraseteke ekolojîk de dê van tedbîran bigirin: 'Jiyaneke bi bazirganiyên biçûk, ji bo enerjiya ceyranê panelên ku enerjiya rojê tomar dikin bi kar bînin, bi lambeyên ku bi dînamoyên bîsîkletê dixebitin bi kar bînin, sergoyên xwe kêmtir bikin, avên di şûşeyan de tên firotan nestînin û ji bo avê jî amûrên parzûnkirina avê û heta ji destê wan bê şevên xwe li derve derbas bikin.'

Endamên komê gotin ku ew bi gelemperî li derve radikevin lê dema baran dibare li malên hevalên xwe dimînin û wiha lê zêde kirin: "Pêkan e ku mirov bi rojê 4 euroyan bijî. Em ji sê rojan careke dan û standinê dikin. Em bi civandin û xwepêşandanên ku ji zorakan re dikin zarokan gelek kêfxweş dibin. Piştî xwepêşandanê em bi zarokan re sohbetê dikin."

*"Zârmalouloux" internet sitesi: http://zarmalouloux.co.cc/index.html*
*Blog adresi: http://zarmablog.blogspot.com/2009/03/les-zarmalouloux-la-tele.html*

**BRUKSEL / ANF**






# Kulîlka binevşî 'Zimanê Ga'

Zimanga belg û kulîlkên wê ji bo çayê û bizrê wê ji bo bidestxistina rûn tê xebitandin.

Bejna wê 15- 70 cm tîrane wek şitilekê bilind dibe. Gelek çiq û şax ji wê şitilê belav dibin û dora wan bi pûrtê ve hatiye dorpêçkirin.

Belgên wê yên wek zimanê ga bi rêzên tevlihev û ji hev cuda rêz bûne, aliyê belgan ê derve bi nîçik û rexên wan xetxet in. Dirêjahiya wan 5-20, firehî 3- 15 cm dibin. Belgên jêrîn mezin ên jorîn biçûk in. Kulîlkên wê yên şînoke, mor, binevşî û leylankî wek gûşiyan şidiyayî û wek sîvankan bi hev ve ne. Belgên binî yên kulîlkan bi pûrtek rengê xweliyê pêçayî ye.

Kulîlka wê 5 per û binevşî, ber bi çiman ve zirav dibe. Di nava wan pelên kulîlkên binevşî û mezin de kulîlkeke din biçûk û spî, serê lêvên wan bi rengîn heye. Welat û dîrok: Welatê wê derdorên Behra Spî, Marmara, Mezopotamya û Îran e. Ji wan deveran belav bûye welatên din. Dîroka wê baş nayê zanîn, lê di gelek kevnar de ji aliyê bapîrên kurdan, farisan ermenî, asûrî hem ji bo zerzewat û hem jî di hekîmiyê de ji bo derman dihat xebitandin.

**Berhevkirin:** Ji meha gulan heta cotmehê kulîlk û belgên wê bi hev re tên berhevkirin û di sîberê de tên hişkkirin. Ji ber ku belgên wê pir bi avî ne, di rojên herî germ de jî hişkkirina wê hinekî zehmet e. Lewre heke li ser sêhlekê bi agirê 50 derece bê hişkkirin, wê çêtir be û di nav firaxên tarî yên cam û devgirtî de li cihên zuha tên hilanîn.

**Têdahî:** Cûreyên Mûsîlajan: Arbînoz, Glîkoz, Galaktoz, Amabilîn, Supînîdîn, Lycopsamîn, Întermedîn, Sîlîkasîdîn, Saponîn, Cureyên Tanînan, Reçîne, Nişaste, Mîneralên cûrbecûr û cûreyên xwê yên madenî.

**Di kulîlkê de:** Musîlaj, Potasyûm û hwd. Di Bizir de: Rûnên Lînolen asît û hwd.

**Kêrhatî:** 1- Edav û enfeksîyonan paqij dike. 2- Wêrekiyê (cesaret) zêde dike. 3- Şîrê dayikê zêde dike. 4- Beden û hêrsbûnê diarimîne (rehet dike). 5- Ji bo sermagirtin û zekemê pir bi fayde ye. 6- Belxemavêjek dijwar e. 7- Sotin û birînan dikewîne. 8- Agir dadixe. 9- Riyên avrêjê û rûvikan paqij dike. 10- Li hember alerjiyên bi rûn, xurîn û avzêlkên çerm zehf bikêrhatî ye. 11- Nexweşiyên hormonan dikewîne. 12 - Bandora xwe ya depresîf heye. 13 -Kêfxweşiyê dide, stresê tavêje, pêşiya nexweşîyên têger (dipekin – derbasî hinekên din dibin) digire. 14- Dohnê ser gurçikan dihelîne.

**Bikaranîn:** 1 Çayê. 2- Selete. 3- Mexcûn. 4 - Birûş û mixle.

**Çayê:** 2 kevçiyên şêranî kulîlk û belgên zimanga bikin nav firaxekê, 200 ml (1 qedeh) ava kelandî berdin ser, bila 15 deqan di demê de bimîne, biparzinin û rojê 3 caran qedehekê jê vexwin. Hûn dişên bi wê çayê rûyê xwe jî pê pansûman bikin, wê rûyê we pê nerm bibe.

**Mexcûn:** Kulîlk û belgên zimanga biherişînin û deynin ser cihê sotî û brîndar.

Her wiha hûn dişên giyayê ji ber çayê mayî jî li cihê dixurin, sotî û birînan bihusin.

*(Ji lêkolîna Bavê Jîndar)*

# Nexweşî zêde bûne

Di roja me de nexweşiyên belavbûyî her roj diçe zêde dibin. Hin nerehetî genetîk in, hinek jî aliyên xwe yên buwar diparêzin.

Di mercên roja me de van nexweşiyên belavbûyî em çiqas nas dikin? Em çiqas li pey sedema nexweşiyan û qonaxên pêşveçûnên wan dikevin? An jî li hember nexweşiyan ji bo bihêzbûna sazûmana jêbexşiyê em li kîjan riyan dinêrin? Der heqê gelek mijarên wek vê de divê em xwedî zanînê bin. Ji bo em nas bikin gelek nexweşî hene.

Lê li hember pirsgirêkên tenduristiyê der heqê dermankirinê û rêbazên demankirinê de em dikarin xwe bîrdar bikin.

Bi pêşveçûna teknolojî û tevlî şaxên zanyariyê ku em di dema mîlenyûmê de dijîn, mixabin em hemberî nexweşiyên ku em navê wan jî nizanin tên. Ji ber germayiya giloverî nexweşiyên nayne nasîn çiqas roj diçe belav dibe. Ji ber vê yekê gelek mirov di nav bêçarebûnê de dimînin. Em ji belavbûyîna van nexweşiyên çiqas roj diçe zêde dibin re şahidî dikin. Zêdebûna van nexweşiyan tevlî bêbîrdariyê, saziyên tenduristî ku erkên xwe bi cih naynin jî dibe sedem.

Di vê nivîsa xwe de em ê der heqê nexweşiyên di roja me de herî pir belav bûne û tên hemberî me pêzanînan bidin. Em ji bîr nekin ku, çawa ku destpêkirina nexweşiyan di destê me de ye, qonaxên qedîna nexweşiyan jî di destê me de ye. Bes ku em der heqê van nexweşiyan de xwedî zanînê bin. Ya girîng jî em ji Xweda Teala yê Şafî re ji bo van nerehetiyan têr hêwîş bikin. **AMED**

# Jiyana Kosem bû fîlm

**Jiyana Sultan Kosem Dêrikî ku kesê herî dirêj ê cîhanê ye dibe beglefîlm. Kosem bi bejna xwe ya 2 metre û 46,5 santîmî ku kesê herî dirêj ê cîhanê ye, ketibû nava Pirtûka Rekoran a Guinness.**

**Du meh berê bi vê taybetiya xwe di cîhanê de hatibû nasîn. Kosem unvana kesê herî dirêj ê cîhanê girtibû. Li gorî agahiyên ku hatine bidestxistin kanaleke îngilîz li ser jiyana Kosem lêkolînê dike û dê jiyana wî bike belgefîlm.**

**Her wiha dê belgefîlm jî li gundê wî pêk were. Belgefîlm dê di 10 rojan de bê kişandin.** MÊRDÎN

# Li 194 welatî geriya



Li Hindistanê karsazekî ji aliyê NY'yê ve li 194 welatên cîhanê yên ku tên nasîn di 6 sal,10 meh û 7 rojan de gera xwe pêk anî û rekor şikand. Kesê bi navê 55 salî Khashî Samaddar li Hollandayê dest bi gera xwe kir û li Kosovayê bi dawî kir. Di vê gera xwe de 390 hezar euro pere xerc kir. Samaddar diyar kir ku di dema gera xwe de gelek caran bi mirinê re rû bi rû maye. Samaddar di berdewamiya axaftina xwe de wiha dibêje: "Min li Amsterdamê dest pê kir li Kosovayê bi dawî kir. Li Afganîstan, Somalî û Surînamê jiyana min di bin rîskê de bû. Li van welatan şer hebû. Gelek caran bi mirinê re rû bi çrû mam. Carekê ez ji otela Kabîlê veqetiyam piştî saetekê bombe teqiya. Carekê ez sê rojan birçî mam."

**YENÎ DELHÎ**

www.arsivakurdi.org